



Arman

Danere rojn amca pest ya Kurdi
Miqdad Mihed Bedixan

Hejmar - No: 6

Çileyay Paşin-January 1996

Buha-Price: 40 000 TL 20 SKR

4 DM



Li Kurdistanê HADEP bi ser ket

"Pirsa Kurdî çareser bikin"

□ % 17.63 dengên HADEP'ê yên Kurdistanê ji bo dewleta Tirk mesajek e ku ew pirsa Kurdî bi riyeke aştî çareser bikin.


B loka Aştî, Azadî û Ked ku ji HADEP, DDP, BSP û SIP pêk hatibû û ji hemû partiyên Kurdan piştgirî girtibû li Kurdistanê % 17.63 deng stendin. Li Diyarbekirê, li Wanê, li Çolemergê, li Batmanê li Îxdirê bû partiya yekemîn, li Şirnexê, Dersimê, Rihayê, Erziromê, Mêrdînê, Sêrtê ya bû partiya duwemîn ya jî gelek deng wergirtin. Lê ji ber ku ji % 10 baraja Tirkiyeyê derbas nekir, hemû reyên wê li xaneya Refahê hatin nivîsandin û Refah li ser piştê wê bû partiya yekemîn a Tirkiyeyê.

Lê balkeş e ku, kesên ku di şer de zerrar dîtine dengên xwe dan HADEP'ê. Yan jî berê 12'ê Îlonê bajarên ku tevgera welatparêz û şoreşger lê xurt bû, HADEP'ê li wê derê deng stendin. Li Tirkiyeyê HADEP'ê zêde deng negirtin. Heta ji çar bajarên mezin yên Tirkiyeyê HADEP % 3.7 deng girtin.

Lê ev % 17.63 dengên HADEP'ê yên Kurdistanê ji bo dewleta Tirk mesajek e ku ew pirsa Kurdî bi riyeke aştî çareser bikin. Herweha ev dengên Kurdan ji bo Ewrûpiyan jî mesajek e ku ew zixtê li hukûmeta Tirkiyeyê bikin da ku pirsa Kurdî çareser bikin.

rûpel: 7 Adiyaman

Dengên HADEP'ê yên Kurdistanê



Kurd bi ser ketin an na?

rûpel: 5

Sala we ya nû
pîroz be!

Serneweyê şima
Pîroz bo!

Salî nwêtan
pîroz bê!

Arman

PKK'ê şer rawestand

Serokê PKK Abdullah Ocalan roja 14'ê Çileyay Pêşin di MED TV de îlan kir ku PKK'ê li Kurdistana Başûr di şerê li hember PDK de yekalî agir bestiyê. Wek têtê zanîn di 25'ê Tebaxê de A. Ocalan bixwe di MED TV de li hember PDK'ê şer îlan kiribû û ev şer wek hemleya duwem a 15'yê Tebaxê ku PKK'ê wê demê li hember dewleta Tirkiyeyê dest bi şerê çekdarî kiribû, bi nav kiribû. Ocalan, lihevkerina Dublînê ya di navbera

PDK û YNK'ê de ji bo êrişê xwe wek sedem nîşan dida û digot em dê li Başûr federasyoneke demokratîk pêk bînin.

Li ser agirbestina PKK'ê, PDK'ê jî daxuyaniyek belav kir ku têtê de weha têtê gotin: "... PDK agirbestinê wek gaweke baş dibîne û dide zanîn ku ne PDK'ê şer dest pê kiriye, wê li hember êrişan xwe, gel û muesseseyên herêmê parastiyê û ew dê wê helwesta xwe berdewam ke. ... Lê piştî wê gava agirbestinê divê gavên din ku

êdî bes PKK destdirêjiya karûbarê Kurdistana Başûr bike, bêne avêtin..."

Ji aliyê din cardin roja 14'yê Çileyay Pêşin de A. Ocalan bi riya tele-konferansê di MED TV de îlan kir ku PKK ji 14'yê mehê û pê ve yek alî di şerê li hember dewleta Tirkiyeyê de agir dibeste û dixwaze pirsa Kurd bi riya aştîyane bête çareserkin. Lêbelê agirbestina PKK'ê wê carê li Tirkiyeyê dengê neda.□

Rûpelek ji dîroka me ya hevdem

DDKO

rûpel: 8-9

Name * Anons * îlan

Ji Redaksiyana Armancê re

Em malbata Kara sala we ya nuh pîroz dikin û di kar û barê we de serfiraziyê dixwazin.

Mustafa û Sebiha Kara -Adana

Sala we ya nû pîroz dikim û saxî û selametiya xebatkarên Armanê dixwazim. Armanc bila her bijî.

S.Yiğit-Entab

Em komek xwendevanên Armancê ji Diyarbekirê ne. Em sala nû ya hevalên redaksiyona Armancê pîroz dikin. Bila sala 1996 ji bo gelê me bibe saleke ronahî, aştî û azadiyê.

Li ser navê hevalan
Ahmed Rohilat-Diyarbekir

Ji hevalên Armancê re

Bi hêviya ku sala 1996 ji bo gelê me yê mazlûm bibe saleke ronahî, azadî û aştî. Bi vê baweriyê ez sala we ya nû ji dil û can pîroz dikim, di karê we yê pîroz de serfiraziyê dixwazim.

Ali Acar-İstanbul

Biraderên hêja û delal, dema we baş be! Gelek silavên evîni û biratiyê ji kûraniya dilê min ê bi kul û derdên giran. Gelek silavên şahî û saxiyê, tevî gulên sor, zer û tev nêgiz û reyhan-û di destpêka rojê de bi dengê kewê delal re û bi tîrêjen rojê re, li ser pêlên deryayê û li ser baskên kevoka aştîyê re li hemû hevalên hêja yê kovara me ya hêja Armancê re diyarî dikim. Ez van gotinan ji bo hatina sala nû ji bo we diyarî dikim. Ez sersala we hemûyan pîroz dikim û ez hêvîdar im ku hûn sala nû bi şahî, evîni û xweşî derbas bikin û herdem serkeftî bin û her xweş bin.

Zeynelabidin Al Hanan-Qibris

Sersaxî

1
9
5
6



1
9
9
5

Sidki Çelen (Hemê)

Me heval û dostekî xwe yê hêja û welatparêzekî dilsoz wenda kir.

Jimalbata wî re, sebir dixwazim, bila serê gelê me sax be.

Bir û baweriyên wî dê di têkoşina me de bijîn.

Platforma Yekîtiya Sosyalîstên Kurdistanê

Radyoya Kurdî

Bo Nürnberg û derûdora wê

Her Yekşem di navbera 18.00-19.00 de li ser pêla 95,8 FM

Radio Z

Adres
Kopernikusplatz 12
90459 Nürnberg-Almanya

Di salvegera 15'an de şehîdên Qamişliyê bi bîr tînim



Necla Baksî

Di 12.12.1980'yî de xuşka min Necla Baksî û zavayê min Huseyîn Aslan û hogirên wan bi destê hêzên kolonyalîst ên Tirkiye û Sûriyeyê hatin kuştin. Ez wan wek neferên têkoşina me ya neteweyî bi bîr tînim û li ber giyanê wan ê pak bi rêzdarî radiwestim.

Şukran Baksî



Huseyîn Aslan

Hemû hejmarên Armancê hatin cîldkirin

Cîld 1- hejmarên 62-92

Cîld 2- hejmarên 93-128

Cîld 3- hejmarên 129-158

Hersê cildên wê 750 SKR .

120 \$

Kesên ku bi posteyê bixwazin, heqê posteyê jî lê zêde dibe.

Adresa xwestinê:


Box: 152 16

161 15 Bromma-Sweden

Tel: 08-803135

Fax: 08-801825

Kitêbeke nû



Adresa xwestinê

Apec-Förlag

Box: 3318

163 03 Spånga-Sweden

Tel:08-761 81 18, Fax: 08-761 24 90

Armanc

Rojnameya Kurdî ya Mehane & Aylîk Kürtçe Gazete

Hejmar 164 (6)

Li ser navê Weşanxaneyê Çarçirayê Xwedî û Berpirsiyar (Çarçira Basın ve Yayıncılık Ltd. Şti. adına Sahibi ve Yazışleri Müdürü): Nesih Çılgin

Redaktore Berpirsiyar:

Remzî Kerim

Redaksiyon:

Mumtaz Aydın

Faris Can

Mürad Ciwan

Nihat Elî

Ehmed Huseyîn

Yakup Karademir

Mahmûd Lewendî

Hesen Mizgin

Emîn Narozi

Berpirsiyarê beşê Dimilî: Malmîsanij

Şertên Abonetiye

Abonetiya Salekê

Tirkiye: 400.000 TL

Skandinaviya: 250 SKR

Ewrûpa: 60 DM

Derveyî Ewrûpayê: 50 \$

Anons / İlan

Niv-rûpel

5.000 000 TL

2500 SKR

500 DM

Hesab No:

0017880 - 6 / BU6 / 01

Yakup Karademir

Akbank T.A.Ş

142 Aksaray-İst.

Adres:

Guraba Huseyinağa Mah.

Dağarcık Sok. Mehmet

Han No: 327B, D:23

Aksaray-Istanbul Türkiye

Tel-Faks: 212-6312515

Adresa Ewrûpayê:

Box: 152 16

161 15 Bromma

Sweden

Tel: +46-8-803135

Faks: +46-8-801825

Hesabê Ewrûpayê:

Postgiro: 4972255-6

Sweden

Baskr: Ceylan Matbaacılık Ltd. Şti.

Rojev



Hilbijartinên 24'ê Çileya Pêşîn a 1995'an hin encamên balkêş bi xwe re anîn. Di vê nivîsa xwe de, dixwazim, qasî ku ez dibînim li ser van encaman rawestim.

Berî her tiştî, her çendî gellek partî başdarî helbijartinan bûn jî, ev helbijartin di welatekî wisa de çêbûn ku hê gellekî ji demokrasiyê dûr e, hilbijêrên vî welatî nikarin îradeya xwe ya rastîn diyar bikin.

Tê gotin ku nifûsa vî welatî 65 milyon e. Ji 15 milyon zêdetir e vî nufûsê Kurd in ku ji hemû maf û azadiyên xwe yê millî û insanî bêpar in.

Li ser seranserê axa ku Kurd lê dijîn şerekî germ, kuştin û malwêrankirin li dar e. Ji sê hezaran bêtir gund hatine şewitandin û xerakirin, sê milyon û nîv Kurd ji wan waran hatine koçbarkirin. Ekonomiya Kurdistanê bi îndustrî û çandiniya xwe, bi avayî û bazirganiya xwe hatiye felckirin. Belengazî, bêkarî, birçîbûnî, nexweşiyên fizîkî, psîkolojîk û exlaqî di civakê de berbelav bûne.

15-20 milyon Alewî ji mafên xwe yê etno-dînî bêpar in, dewlet bi çavekî mirovayî li wan nanihêre, muamela zirbaviyê bi wan re dike. Kutleyên dîndar ên musulman ên xwedan terîqet û yê ku dixwazin li gorî esasên baweriyên xwe bijn (ku ew jî bi milyon kes in) teror û tehdîda Kemalîst li ser xwe dibînin. Eqliyetên milî yê wekî Erebb, Laz, Asûrî-Suryanî, Çerkez, Rûm, Ermenî û wekî din, yê dînî; Xiristiyan, Êzîdî û yê din bi darê zorê welê hatine hişkirin ku nikarin bêjin "em ne serbest in" jî.

Medyayek bêteref û azad li Turkiyê tune. Rojname, televîzyon û radyoyên dewletê û yê şexsî bi hev re sejde birine ber îdeolojiya resmî, ji çarçeva hudûdê ku wê daniye dernakevin. Li aliyê din her grûbeka medyayê bûye berdevkê partiyekê resmî û propaganda wê partiyê dike.

Hin jî hudûd û awayê jiyana insanên eşkerakirina bir û baweriyên ji alî ordiyê ve tê tesbîtkirin. Gava ku pirs were ser noxta dawîn, şel û fikreke ku ordî li hemberî wê be zû bi zû tê rawestandin.

Dewlet weka dêwekê ketiye ser dilê milletî. Siyasetmend û birokrat, bi saya dewasatiya vî dewletê ked, sermiyan û hebûna milletî talan dikin, didizînin û çarçûr dikin.

Dezgehên xwendin, ilim û îrfanê, xwendegehên nizm û bilind hemî bi dewletê ve hatine girêdan, ji ilim, azadî û heqîqetan bêpar mane, bûne berdevkên siyaseta serdest.

Jin, ciwan û zarokên vî welatî di bin dijwariyê û bîndestiyên giran de ne, di jiyana civakî û siyasî de bêpar in. Bi deh milyon insan ji bo ku bêkar in, an xwedan karekî kêmmeaş in, ji bo ku ketine gaîla jiyana xwe û zarokên xwe, na taqetê, ne wextê û belkî jî ne dilxwaziyeke di xwe de dibînin ku berê xwe bidin pirsgrêkên welêt. Rewşa giran û têkil-hev ew kor, kerr û lal kirine.

Bi milyon insan ji emniyeta can û malên xwe bêpar in, qîmeta jiyana insan bûye pênc pere. Tehdîtkarê herî mezîne

li ser jiyana insanên bi dezgehên xwe yê sivil û eskerî û yê dizî û eşkere dewlet bi xwe ye. Piştî mafiyayên piçûk û mezin, şebekên têr û birçî tehdîdê dibin ser jiyana insanên. Ji bo pariyeke nan roj derbas nabe ku insan neyên kuştin, mal neyên wêrankirin, namûsa jin û keçan bînpê nebe.

Dawiya hijmartina xerabiyên ku li Turkiyê rû didin nayê. Gava li welatekî rewş bi vî awayî be, ne mumkun e ku ew karibe helbijartineke demokratîk bike ku hilbijêrên wî welatî îradeya xwe ya rastîn derxin meydanê. Encamên helbijartinên vî dawiyê jî helbet îradeyek demokratîk û rastîn dernexistin. Tevî vî jî bi kêmasî di van çend salên pêşiya me de ev helbijartin wê li ser qedera civakên Turkiyê rolekê bilîzin. Loma jî bivê nevé meriv wê pirsê dike ku ka gelo tevî hemû halan, helbijartinan çî encam dan?

kumetê deynin. Encam belkî jî ji hemuyan zêdetir ew e ku millet tevî ew qas dijwariyê û perîşaniyan jî hukumetê nuh dernexistiye, qerara xwe li ser avabûna hukumetê diyar nekiriye. Hukumet jî partiyên berê yê ser hukum stendiye lê nedaye tu partiyên muxalîf. Ev wê encamê jî diyar dike ku hilbijêr çî li ser hukum çî jî li muxalefetê jî hemû partiyên îro yê resmî bêzar e, baweriyayê xwe bi wan nayne, rîya şareserkirinê problemên xwe di hukumetbûna wan de nabîne. Lê milletî bi aqlê selîm hereket nekiriye û bi reyên xwe hukumetê dernexistiye, loma jî avakirina hukumetê cardin di destê wan partiyên de maye ku ew ji wan ne razîye.

Siyaseta Turkiyê bi tevayî di îmtîhanê de maye, bêstîkrartir û qelstir bûye. Di nava vî şikestina tevayî de yê ku herî bêtir şikast xwarine ANAP û CHP ne.

HADEPê ku bû şemsiye ji bo Bloka Ked, Aştî û Azadiyê.

Tevî hemî dijwariyên ku li jorê hatin diyarkirin ew dengên ku HADEPê li bajarên Kurdistanê girtin nişana serkeftineke hêja ne. Diyardeya wê yekê ye ku, mesele wekî ku dewlet iddîa dike, bi "terora PKKê û pêşîka derva" nayê îzahkirin û bi kuştin û lêdanê nayê çareserkirin. Milletek dawa mafê xwe yê rewşa dike, doza aştî û azadiyê dike. Turkiye îdî ne li qada netewî ne jî li ya navneteweyî dikare van dengên veşêre. Divê bersîveke jî pirsên vî potansiyelî re bibîne. Ev potansiyel, heke bi zanîn û hişyarî xwedî lê bê derketin di mesela çareserkirina pirsê Kurdî de, her ku here wê çî li siyaseta îroyîn a dewleta Tirk teng bike.

Li derveyî Kurdistanê, li metropolan û li bajarên rojava, tifaq li ser navê HADEPê di dereceyek ciddî de deng negirtine. Çend sebebên vî yekê bi baweriyayê min ev in. Çepên Tirk yê ku di nava vî blokê de bûne, di tarîxa Turkiyê de tu caran nebûne hêzeka ciddî, her gav wekî hêzên marjînal mane, îro jî bi perîşaniyê mezîne îdî wekî hêzên siyasî nayên hesabkirin û îdî ne marjînal in jî. Van hêzan bi wan gotinên xwe yê ji derdê civakê yê berbiçav dîr jî li rojava ne ku her deng jî vî tifaqê re neanîne, nehiştine ku bi awayekî maqûltir ev platform dengê xwe bigihîne hilbijêran û wan îkna jî bike.

Alewîyan, bi taybetî jî Alewiyên Tirk dengên xwe di dereceyek ciddî de nedane vî tifaqê. Dengên Alewîyan di navbera DYP û CHPê de perçe bûne.

Kurdên ku van salên dawiyê koçkirine çûne rojhilatê Anadoluyê, piraniya wan jî ber ku bêqeydbûne, nikaribûne ku dengên xwe bikarbinin. Yê ku dengên wan hebûn jî bi kemiyetek ciddî deng nedane vî tifaqê. Ev yek tenê bi mesela anti-demokratîkbûyînê û zordariyê nayê şirovekirinê. Çimkî antidemokratî li Kurdistanê jî van cihan bêtir li dar e. Xwiya ev tifaq xwedî li daxwazên wan derneket yan dengê xwe negihand wan, mesela bicîhbûnê, kar û birçîbûnê, mesela vegera wan a ser erdê wan û avakirina gundên wan, tezmînkirina zerrar û ziyana wan û gellek pirsên din derneketine meydanê, yan jî partiyên din di van waran de ew xapandin, hêvî û daxwazên wan îstîsma kirin.

Bi vî helbijartinê jî derket ku ev tifaq bi bingeh û avayiya xwe ya esasîn, bi terefdarî û hilbijêrên xwe ne partiya Tirk û Kurdan tevde, lê di esasî de ya Kurdan bû. Îdî jî bilî qanûna avakirina partiyên û jî bilî qanûna helbijartinan çu bahane û bend li ber hin ji wan partiyên vî tifaqê neman ku bêjin em ne tenê partiyên Kurdan in, lê em partiyên Kurd û Tirkan in. Bira bes xwe bixapînin, ew tu caran nabin partiyên Tirk û Kurdan muşterek, Tirk wan bi vî awayî nabînin û xwe naspêrin wan.

Ew jî îdî divê dev jî vî îdiaya vala berdin. Çimkî ne şerm û ne jî gunehkarî ye ku ew wekî partiyên Kurdan li meydanê bin. □

Encamên Hilbijartinan

Mûrad Ciwan

Adet e, çî çep çî rast hema hema tevayiya ronakbîran li Turkiyê li ser tesbîtekê mutefiq in. Piştî her helbijartinê îdîa dikin ku millet bi aqlê xwe yê selîm hereket kir û encamên herî baş derxist. Ev îdîa di vî helbijartinê de jî tê tekrarkirin. Xwedêgiravî rîya herî baş, milletê bi dengê xwe rêdaye, yanî zarûreta yekbûna ANAP û DYPê û avakirina hukumetê jî yekîtiya wan. Partiya Refahê jî mesaja hilbijêran li gorî xwe eşkera dibîne û dibêje ku xwedêgiravî milletî hukumet daye Refahê.

Piştî helbijartinan pênc partî ketine meclîsê. Partiya herî mezîna Refah e %21 denga girtiye. Du partiyên baskên rast (DYP û ANAP) her yekê %19'yê denga girtine. Partiya çep a nasjonalîst DSP %14 û partiya mîratxura Kemalîzmê CHP %10,5'ê denga wergirtine. Benda li ber kevtina hundurê parlamentoyê %10 e. Partiyên din di binê hudûdê vî bendê de man. MHPê %8,5'ê denga û HADEPê ku bûbû şemsiya Bloka Ked, Aştî û Azadiyê %4,17'ê denga girt.

Li hemberî encamîna wiha bi hezîmet, "dalqawuqiyek" mezîne e ku meriv bibêje mesaja vî milletî mesajekê aqlê selîm e û eşkere ye û hela hela dixwaze ku her du partiyên baskên rast bi yek bin û hu-

Ji ber ku ANAP tevî ku partiya muxalefetê bû jî ev şikest xwariye meriv dikare bibêje ku ya herî bêkêr ew derketiye. Refah li gorî ku di muxalefetê de bû jî zêde pêşde neçûye û ne rast e ku meriv para serkeftineke mezîna bide vî partiyê. DSPê dengên hin hilbijêrên baskên rast û yê nasjonalîstên kemalîst girtin û jî bo xwe serkeftinek bi dest xist. Meriv dikare bibêje ku li welatekî ku hingiya di nav siyasîyan de talankerî, dizî û derewbûne adet û durustî bûye meziyeteke mezîna, Ecewît îmajekê durustbûnê da xwe û bi vî awayî dengên xwe zêde kirin.

Partiya herî serkeftî di nava vî şikestê de tevayî de DYP ye ku wê jî ev yek bi saya jinbûna seroka xwe û propaganda yekîtiya gumrukê, her wiha bi saya endamên xwe yê nuh; şefên polisyan, waliyên Kurdistanê, generalên ordiyê û birokratên mezîna ev yek bi dest xistiye.

Di encama van helbijartinan de kadroyên partiyên ji demên berê pirtir ew kes in ku statukoîst, bi dewletê ve girêdayî, paşverû, otorîter û olperest in, li dijî demokrasiyê, libéralîzekirina aborî û siyaseta welêt û pêşdebirina civakê ne. Bi vî xusûsiyeta xwe jî helbijartinan welat ne ku bi pêş de, lê bi paş de biriye.

Di vî helbijartinê de divê meriv bi awayekî taybetî balê bikşîne ser rewşa

Raman

Yekîtiya gumrukê û pirsgirêka Kurd

Rojda Çelikel

Di 13' yê Çileyay Pêşin de, Parlamentoya Ewropayê (PE) piştî dengdanê, biryara qebûlkirina Yekîtiya Gumrukê di navbera Tirkîyeyê û Yekîtiya Ewropayê (YE) de stand; 343 li gel, 149 li dijî û 36 bêdeng. Dema diyar bûbû ku PE ji bo qebûlkirina YG hin şertên bingehîn daye pêşya Tirkîyeyê, siyasatvan û sermayedarên Tirk dest bi dîplomasiyek mezin kirin ku teşîrê li parlamenterên Ewropî bikin. Vê dîplomasiya wan berhemên xwe dan û axirê PE yê yekîtiya gumrukê qebûl kir.

Berî dengdanê, Parlamenterê PE yê Îspanyolî Carnero Gonzales ji bo amadekirina raporekê Tirkîyê ziyaret kir. Gonzales ku di navbera rojên 13-16 Îlona 1995'an li Tirkîyeyê bû, rapora xwe pêşkêşî Komîteya Pirsên Karên Derve, Ewlekarî û Parastinê kir. Gonzales di rapora xwe de weha dibêje: "Wezîfeya min ew bû ku mesaj û pirsên Parlamentoya Ewropayê bi awayekî zelal bidim îfadekirin û di derheqê rewşa siyasî û civakî de, bi taybetî li ser pêşveçûna pêvajoya demokratîkbûyînê, guhertinên qanûn û Qanûna Esasî, rewşa Rojhilata Tirkîyeyê, terorîzmê, rewşa 6 parlamenterên DEPê û rewşa Qibrîsê, agahdarî bistînim."

Di nav siyasatvan, rojnamevan, sermayedar û parêzgerên mafên mirovan ku Gonzales ziyaret kir de, ew nav hebûn; Tansu Çiller, Algan Hacaloglu, Husamettin Cindoruk, Suleyman Demirel, Mesur Yilmaz, Erdal Inonu, Mehmet Mogoltay, Bulent Ecevit, Deniz Baykal, Hikmet Çetin, Yavuz Onen, Akin Birdal, M. Ali Bيران, Murat Belge, nûnerên TUSIADê, Parlamenterên DEPê û hwd.

Gonzales, piştî behskirina dîtînen "jeopolîtîkî û ehemiyeta Tirkîyeyê ji Yekîtiya Ewropayê" re, di hevdûdîtînen xwe de ew pirsên ku dida pêş ev bûn: Pêvajoya demokratîkbûyîna Tirkîyeyê, guherandina Qanûna Esasî, Maddeya 8'an a qanûna anti-terorê, mafên mirovan, parlamenterên DEPê û pirsgirêka Kurdî.

Demokrasi an Sekularizm?

Yek ji wan argumentên ku Tirk û hin parlamenterên YE ku li gel YG ne, didan pêş, ew bû ku Tirkîye wekî welatek misilman bi awayekî "sekularî" (laik) tê îdarekirin. Algan Hacaloglu, wezîrê dewletê ku ji mafên mirovan berpirsîyar bû, di hevdûdîtînen xwe yê bi Gonzales re, got ku Tirkîye di navbera dinyaya xiristîyan û ya misilman de pirek e û YA bi rêya yekîtiya gumrukê dikare alikariya berdehamiya ve rewşê bike. Tevî ku ew dîtîni ji aliyê Gonzales ve nayê pejirandin, diyar e gelek parlamenterên YE ku li gel YG deng dan, bi vî argumaentê îkna bûne û Tirkîyeyek sekuler, ji Tirkîyeyek demokratîk muhîmtir dîtîne.

Gelek ji siyasatvanên Tirk ji Gonzales re gotin ku eger yekîtiya gumrukê neyê qebûlkirin dê fundamentalîzm pêş bikeve û ji bo Ewropayê jî bibe talûkeyek. Ev dîtîni ji aliyê gelek kesan ve hate pejirandin û ji bo qebûlkirina YG yek ji wan sebebên

esasî bû. Hetta ew tirsay Ewropîyan bi qebûlkirina YG jî wenda nabe, tirsê jî berdeham e; di munaqeseyên berî dengdanê de, parlamenterê grûba PPE (Konservatîv) Martin Schultz wisa dibêje: "Eger yekîtiya gumrukê refaha herkesî zêde neke, wê demê dê bêstîqarî dest pê bike û rê jî bo hêzên fundamentalîst vebe."

Piyaseya Asyaya Navîn

Pirsek ku Tirkîye li ser sekiniye û mirov dikare wekî "bertîl" binirxîne, piyaseya Asyaya Navîn e. Dema Gonzales Tansu Çiller ziyaret kir, ew pirs gelek vekirî derket holê. Tansu Çiller di destpêka axaftina xwe de ji Gonzales re behsa ziyareta xwe ya komarên Tirkî yê li Asyayê û ew sermiyana ku Tirkîyeyê li wir bi cî kiriye kir û got: "Em dixwazin van îmkanên ku li wir derketine, bi Ewropayê re parve bikin". Herweha Serokkomarê Tirkîyeyê Suleyman Demirel jî behsa ziyareta xwe ya Mongolistan û Tacikistanê kir û got ku Tirkîye dikare rola pireke bilîze.

Wisa xuya ye ku PE menfeetên aborî yê YE jî dane ber çavan û biryar sitendîne. Di konferansa çapemeniyê ya ku piştî hîlbijartina yekîtiya gumrukê hate çêkirin de, sekreterê Komîteya Karên Derve Abel Matutes got ku yek ji wan sebebên dengdana "belê", "faktorên ticaretî an jeostratîjî" bû. Matutes got ku Tirkîye dikare rola "pirek" di navbera Asya û Ewropayê de bilîze. Ev jî tê wê maneyê ku YE dixwaze bi rêya Tirkîyeyê xwe bigihîne Asyaya Navîn û li tenişta Rûsya û Amerîkayê bibe faktorek bingehîn.

"Tirkên li Ewropayê biparêzin"

Piştî dengdana YG li Parlamentoya Ewropayê de, dor hat ser biryaran (resolution). Di nav grûba Parlamentoyê ku pêşniyar jî bo biryar amade kiribûn ew hebûn;

V (Grûba Şin), PSE (Grûba Partiya Sosyaldemokrat), PPE (Grûba Partiya Gel, konservatîv) û ELDR (Grûba Partiya Liberal, Demokratîk û Reformîst).

Di nav wan pêşniyarên ku ji bo biryar hatibûn pêşkêşkirin de ferqên gelek mezin hebûn. Di pêşniyara Grûba ELDR de tê gotin ku Tirkîye welatek demokratîk e, li Tirkîyeyê çapemeniyek azad heye û huqûqa Tirkîyeyê serbixwe ye. Herweha di pêşniyara ELDR de pesindayîna Tirkîyeya sekuler (laik) jî heye. Lê tevî vî yekê tê qebûlkirin ku li Tirkîyeyê azadiya îfadekirina ramanan tuneye, Qibrîs hin jî dagirkirî ye û Tirkîye mecbûr e hurmeta mafên mirovan, mafên hindikayiyan û dewleta hiqûqî bigre û ew peymanên navnetewî ku Tirkîyeyê îmze kiriye divê bêbî bicîhkirin. Li ser pirsgirêka Kurdî jî -dîsa di beşa tespîtan de- ELDR wisa dibêje: "Gelek hîkûmetên Tirk, qampanyayek hişk û dîrûdirêj ajotîne ku daxwazên Kurdan yê meşrû yê ji bo qismek mafên xweidarekirinê û mafên kulturî bipelçiqîne lê ew politîka têk çûye." Ji aliyê din ELDR vî yekê jî îddîa dike: "Herweha PKK jî, ku dixwest daxwaza xwe bi êrîşên terorî têxe jiyandê, hem di nav xelkê Kurd û hem jî di nav Tirkan de têk çûye" (Bend E). Di beşa pêşniyaran, benda Şan de jî ELDR li ser



Bistek ji civîna parlamentoya Ewropayê

pirsgirêka Kurdî weha dibêje: "Parlamentoya Ewropayê Tirkîyeyê dawetî çareserkirina pirsgirêka Kurdî bi rêya aşitîyê dike". Tişteke din e balkêş jî heye ku di derheqê şiddeta ku li dijî Tirkan -bi taybetî li Almaniyayê- tê bikaranîn de ye: "PE tîne bîra dewletên endam (YE) ku hemwelatiyên Tirkîyeyê ku li di nav erdên wan de dijîn, li hember êrîşên fizîkî û yê bi şêlên din ku mafên wan ên însanî îhlal dikin, biparêzin û tedbîrên hiqûqî bistînin." (Bend 7)

Grûba V jî di beşa tespîtan de dibêje ku PE ne razî ye ku ji bo çareserkirina aşitî û siyasî ya pirsgirêka Kurdî û ji bo dawî lêanîna şerê li herêma Kurdan hê jî tu pêşveçûn tune ye. Dîsa Grûba V jî di derheqê pirsgirêka Kurdî de çareserîyê aşitî û siyasî dixwaze.

Ew pêşniyarên li jor, ku ji aliyê Grûba ELDR û Grûba V ve hatibûn amadekirin nehatin qebûlkirin.

YG; Serkeftina dewleta Tirk?

Ew kêfxweşiya ku bi biryara YG li Tirkîyeyê destpêkir, piştî demek kurt wenda bû û ciyê xwe ji şik û tirsê re hişt. Belê; Parlamentoya Ewropayê YG qebûl kiribû lê bi vî re hin şert û biryar jî dabûn pêş. PE di pirsgirêka Kurdî de çareserkirin ji dewleta Tirk û rêxistinên Kurdan dixwest.

Ew pêşniyara ku bi piraniya dangan (395 belê, 19 na, 113 bêdeng) hate qebûlkirin ya Grûba PSE (sosyaldemokrat) û Grûba PPE bû.

Grûba PPE û Grûba PSE di pêşniyara xwe ya ji bo biryarê de hem dibêjin ku PKK çalakiyên xwe yê "terorîstî" berdeham dike (Bend F) û hem jî ku dewleta Tirk hin jî tedbîrên eskerî distîne û gundên Kurdan vala dike (Bend G). Lê di beşa pêşniyaran de tişteke gelek balkêş heye ku hem gavek yekemîn û hem jî dîrokî ye; PPE û PSE li ser pirsgirêka Kurdî vî pêşniyarê tînin: "PA neayê ji hîkûmeta Tirk, PKK û nûnerên din yê gelê Kurd dike ku ji bo çareserkirinek siyasî û aşitî ji bo pirsgirêka Kurdî çî ji destê wan tê bikin û ji PKKê dawê dike ku xwe ji şiddetê dûr bi-

xe û ji hîkûmeta û parlamentoya Tirk dawê dike ku "Rewşa Awarte" jî holê rake û di derheqê bidestxistina îmkana îfadekirina huviyeta kulturî jî bo hemwelatiyên bi eslê xwe Kurd bewî bide, li gel ku yekîtiya erdê Tirkîyeyê bête garantîkirin û hurmet lê bê girtin" (Ben 13)

"Hukûmeta Tirk û nûnerên gelê Kurd"

Ev pêşniyar li Tirkîyeyê bû sebebê nexweşiyek gelek mezin. Sebeba wê jî ew bû ku PE'yê hukûmeta Tirkîyeyê û rêxistinên Kurdan wek teref didî û ji wan çareserkirin dixwest. Li gor vî pêşniyarê, rêxistinên Kurd yê îlegal meşrû ne û nûneriya Gelê Kurd yê li Kurdistan Bakûr dîkin. Ev yek rê vedike ku bi rengê jî berê cûdatir dîplomasiyê bikin. Vê pêvajoya dawî ku bi semînera Osloyê despêkir û bi konferansa Kolnê berdeham kir, sînyala guherandina politikaya Ewropîyan diyar dikir. Di wan semîner û konferansên resmî-nûnresmî de rêxistinên Kurdistan Bakûr, PKK, PYSK (Kawa, RNK-KUK, TSK, TS û YEKBÛN), PSK, PİK û PDK-B beşdar bûbûn. Di wan platforman de dîtînen rêxistinên Kurdan hate zanîn û hin nuxteyên mûsterek hatin tespîtîkirin ku ji bo biryara PE bibe bingeh.

Dervamayîna HADEPê û temsîlnebûyîna îrada gelê Kurd di Parlamentoya Tirkîyeyê de dikare bibe sebebê mezin ku Ewropa berê xwe bide rêxistinên Kurdan û tîkiliyan bi wan re çêbike. Çewtiya herî mazîn ku îro rêxistinên Kurdan dikarin bikin, îstîsmarkirina rewşa HADEPê û avakirina dezgehên naylon e. Îro sînyalên wê talûkeyê hene.

Wezîfeya li hember rêxistinên Kurdan avakirina dezgehê ku bikaribe nûneriya Kurdên Kurdistan Bakûr bike ye, ku Kurd bikaribin di siyaseta navbera Yekîtiya Ewropa û dewleta Tirk de bibin xwedî gotin û fonksiyon. Tirkîye bû perçeyek Ewropayê û herweha Kurd û pirsgirêka Kurd li Kurdistan Bakûr jî. Di vî maneyê de eger Kurd baş bi kar binin, rûpelek nûn jî bo Kurdan vebiye. □

Kurd bi ser ketin an na?

Neynik

Nûçe

Osman Aytar

Hilbijartinên ku ji bo bi destxistina "îstiqrar"ê di 24'ê Çileyê Pêşîn a 1995'an de li Tirkîyeyê û li Kurdistana Bakur çêbûn, di şûna îstiqrarê de, pirs û pirsgerêkên dewletê zêde kirin. Ji ber ku tu partî nikare bi serê xwe hukûmetê deyne, munaqeseyên di derbarê kombînezonên koalîsyonê de ji şeva hilbijartinan dest pê kirin.

Gelo ji bo doza Kurdan ji sendoqên hilbijartinan çi derket? Bê şik, bê îstiqrariya Anqerê û giranbûna pirs û pirsgerêkên wê tesîr li ser gelê Kurd jî dike. Ev, dikare bibê mijarê nivîseke din. Lê ji bo Kurdan, ji sendoqan bi giranî daxwaza çareserkerîna demokratîk û aştiyane derket. Yek ji mijarên bingehîn ên munaqeseyan, ev encam e.



Encamên hilbijartinan berhemên kîjan rewşê ne? Bersiva wê pirsê, ji bo şirovekirina encaman girîng e.

Wek hin berpîrsiyarên HADEP'ê jî gotin, li hin bajarên Kurdistanê zilm û zordestiya dewleta Tirk ne wek ya berê bû, lê ev di eslê xwe de şiklî bû. Bi tevayî girtin, tehdîd û şantajên dom kirin.

Wext hindik bû û îmkanên propaganda û meşandina karûbarên hilbijartinan jî ne adîlane bûn.

Piraniya Kurden ku ji ber zilm û zordestiya dewletê ji deverên xwe bar kiribûn, li cihên xwe yê nû neqeydkirî bûn û ji bo wê yekê dengên xwe nedan.

Bloka ku bi beşdariya HADEP, DDP, BSP û SIP'ê çêbû, gaweke baş bû; lê têrê nedikir. Aliyê Tirk ê bloqa "ked, aşti û azadî" jî xwe gelek zêf bû. Hin Kurd jî ji bo berjewendiyên xwe yê şexsî çûn ketin nav partiyên ku bi awayekî giştî berjewendiyên dewleta Tirk diparêzin.

Di dema hazirî û tespîtkirina namzedan de jî gelek kêmasî û çewtî çêbûn. Pir mixabin hin aliyan dev ji parastvaniya grûbîtiya teng ber nedan...



Ger mirov li gor hedefên ku HADEP'ê danibûn li ber xwe li encaman binêre, HADEP ne bi ser ketiye. Ji % 15-16 pir dîr e.

Lê ger mirov di rewşa îroyin de ne realîstbûyîna hedefa %15-16'yê qebûl bike û rastiya xwe bingeh bigre, wê wextê girîngi-

Aşkere ye ku ne serxoşiya ser ketinê, ne jî biçûkdîtina encaman, pirsan çareser dike. Zemin û fersendên ku bi hilbijartinan hatine bidestxistin, divê bi awayên berhemkar bîr bîkaranî. Wek minak, biryara li Anqerê civandina 26 namzedên HADEP'ê gaveke baş e. Lê kar pir e, astengî û dafik jî zêde ne. Di vî warî de gelek tecrûbeyên HEP û DEP'ê hene û divê hin çewtî dubare nebin.

ya dengên HADEP'ê hin baştir zelal dibê. Bi ya min, di gel hemû astengî, kêmasî û çewtîyan, li hin bajarên ku li wan deveran şerê qirêjî li dijî gelê Kurd bi tundî tê meşandin, yekem an jî duwem partîbûyîna HADEP'ê pêşketinek baş e û serketinekê berbiçav e.

Beraj derbas nekirina HADEP'ê yan jî li Kurdistanê û Tirkîyeyê hejmara Kurdan, ji bo hazirîya pêşerojê girîng in, lê divê ev nebin sebeb ku dengên HADEP'ê biçûk bî-

ditin. Çunkî her tişt li gor rastiya xwe bi mane ye.

Qezenca tevgera neteweyî ya Kurdistanî ne tenê ev e. Pir in.

Berê her tiştî, platforma hilbijartinan bi alaqeke mezin, bû platforma li dijî zilm û zordestiyên dewleta Tirkîyeyê derketinê.

Pirs ji hevaltî yan jî ji piştgirtina partiyeke Kurdistana Bakur derket. Pêla ku rabû, pêla daxwaza çareserkerîna demokratîk û aştiyane bû. Ji bo wê jî gelek mirovên ku ji wan nedihat payin, bi aşkerayî alîkariya HADEP'ê kirin...



Ki çi dibêje bila bibêje, di şexsê HADEP'ê de doza Kurdî bi ser ket. Hin kes % 4.17 deng girtina HADEP'ê ji bo dîtîne xwe yê şovenîst bi kar tinin, lê gelek nivîskarên rojnameyên Tirkîyeyê jî, pêşveçûna HADEP'ê wek "referandum" qebûl dikin. Ev, wê munaqeseyan geştir bike.

HADEP'ê jî fersendeke mezin bi dest xist. Her çend, namzedên wê neketin parlamentoya Tirkîyeyê jî, ji aliye meşrûyeta civakî hin namzedan parlamentêrî heq kirine. "Mexdûriyeta" HADEP'ê, dikare ji bo hin gavên bingehîn bibê wê jî.

Aşkere ye ku ne serxoşiya serketinê, ne jî biçûkdîtina encaman, pirsan çareser dike. Zemin û fersendên ku bi hilbijartinan hatine bidestxistin, divê bi awayên berhemkar bîr bîkaranî. Wek minak, biryara li Anqerê civandina 26 namzedên HADEP'ê gaveke baş e. Lê kar pir e, astengî û dafik jî zêde ne. Di vî warî de gelek tecrûbeyên HEP û DEP'ê hene û divê hin çewtî dubare nebin.

Encamên hilbijartinan divê ji aliye tevgera neteweyî ya Kurdistana Bakur jî baş bîr bîkaranî. Dengên ku HADEP'ê girtin, di rewşa îroyin de ji bo hebûna şiyarbûna neteweyî, hesasiyeta dijî politikayên dewletê û psikolojiya giştî ya gel, xwediyê maneyên girîng in.

Sûriye

Refêke girtiyên Kurdên din

Qamişlo Ji ber doza vergerandina mafê hemwelatiya 150 hezar Kurd, di destpêka meha 12'an 95'an de dewleta Sûriyeyê careke din 17 welatperwerên Kurd girt û avête zindanê. Ew jî ev in: 1-Abdulah M. Kolo, 2- Abdulrehman A. Elî, 3- Mohamed M.Ş. Dawûd, 4-Ubeyd N. Mihê, 5- Mustafa X. Îsa, 6- Mûsa M. Elî, 7- Mevdel M. Salih, 8- Elî S. Huseyin, 9. Feysel F. Yunis, 10- Ednan F. Mohamed, 11- Abdulkerîm Î. Çaçan, 12- Abas A. Gelo, 13- Abdulgenî N. Buro, 14- Ehmed F. Ehmê, 15- Newaf H. Reşîd, 16- Abdulsemed N. Buro, 17- Faris M. Xelîl

Ev bû salek hinek girtiyên din hen in. 1- Mohamed A. Huseyin, 2- Teyyar M. Begê, 3- İbrahim Betal, 4- Kamiran Henan.



Sekreterê PDK-Î Hesenzade Buroya me ziyaret kir



Stokholm Di 23'ê Çileyê Pêşîn de Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê (PDK-Î) birêz Abdullah Hesenzade teyî heyetekê buroya me ya Stokholmê ziyaret kir. A. Hesenzadeyî li ser Kurdistana Îranê agahdarî dan hevalên redaksiyonê û li ser Armanê û rewşa Kurdistana Bakur agahdarî wergirt.

A. Hesenzade got, li Kurdistana Îranê guhartinek berbiçav çêbûye, zordariya rejimê berdewam e û şerê me jî li dijî wan berdewam e.

Abdullah Hesenzade hîn bi gazind bû ku radyoya wan "Dengê Kurdistana Îranê" hîn girtiye û ew nikarin weşana radyoya xwe bikin da ku gelê Kurdistanê ji kar û xebata wan agahdar bibê. Li ser sebebê girtina radyoya xwe jî digot; "ev neticeya t êkiliyên hêzên Kurdan yê bi dijmin re ye" Wek t ête zanîn teqrîben berê 7 mehan YNK'ê bi darê zorê "Dengê Kurdistana Îranê" dabû rawestandî.

Li ser pîrsa me ya t êkiliyên PDK-Îranê bi PDK-Rêberatiya Şoreşger re çawa ne, A. Hesenzade got ku, t êkiliyên wan baş in û bi ken got, ne ew ji me dikujin ne em jî wan.

Pûlên posteyê yê Kurdî



Ev demê ku t êkiliya posteyê di navbera başûrê Kurdistanê û cihanê de heye. Arman ew e ku ev bi ser bikeve û bi çîh bibê. Eger ev bi ser bikeve, gelek Kurden ji başûr ku li derveyî welatê xwe ne; d ê bikaribin bi meriv û nasên xwe re t êkevin t êkiliyê, dinivîse kovara pûlkomkirinê ya Swêdî ya bi navê Filetelistan, di hejmara

95.11.09'an de. Kovar dinivîse ku di 1992'an de, parlamentoyeke bi pîrpartî hatiyê hilbijartin û hukûmetek jî hatiyê avakirin. Dezgeha postexaneyê jî gaveke dîrokî avêtîye û jî bo t êkiliya hundir jî çend pûlên posteyê çapkirine. Bi pêşveçûna otonomiyê ve jî întereseya pîrsên posteyî jî zêde bûne. Postexane jî nû ve hatiyê

çêkirinê û hejmara kargerê wê jî gihaştîye sedan. Postexaneyê bi îmkanên kê m sê babet pûlên rengîn û buhayê wan cihê cihê çapkirine. Li ser pûlê yekemîn wêneya xaniyê parlamentoyê heye. Arman bi vê dîmenê ew bûye ku êdî li vir demokrasiyê destpêkiriye. Li ser pûlan jî sala 92.06.4 heye û ev jî roja yekemîn a civîna parlamentoyê ye. Mohra sala 93.06.04 jî diyar dike ku salek ji ser çêkirina parlamentoyê re derbas bûye.

Ji van pûlan du tene bi hêlîm (zank) in û yek jî meriv divê bi xwe hêlîm bike. Tê diyarkirin ku kaxêzên pûlan bi rihetî nayên dîtîne û yek jî li ser Iraqê ambarogoya NY heye. Derdekî din jî ew

e ku çapxaneyên nûjen tune ne. Ji bo wê jî ew d ê jî vê şûn ve pûlan li derveyî welêt çap bikin. Hinek rêxistinên ku hevalbendên Kurdan in jî alîkariyê dikin.

Li Almanyayê du pûl hatine çapkirin, dinivîse kovar. Li ser yekê minare û bajarê kevn ê Hewlerê heye. Ev jî rengîn in û buhayê wan cihê ne.

Wezîrê Gugastîne Dr. Îdrîs Hadî Salih karê çapkirina pûlên nû daye Kurdekî ku li Swêdê dimîne. Li ser van pûlan wêneya kewekî û şîbekî d ê hebe.

Li gor kovarê t êkiliya postê berê di ser Baxdadê re dibû. Lê jî sala 1991'an bi vir de, ev îmkan tune. Ji bo wê jî Kurden li derveyî welêt karê postexaneyê bi alîkariya nasên ku t ên û diçin, didin kirinê.

Dezgeha navneteweyî UPU ku pîrsên postê di nav hukûmetan de çareser dike, ji bo hinek prensîban nikaribûye postexaneya Kurdî wek dezgeh nas bike

Cano I.



Zanist û Teknîk

Amadekar: Hesên Mizgîn

Şofêr ne pêwîst e, otomobîl bi xwe rê dibîne

Peter Nîlson

Profesorekî kevn ku di pependiyê de bêhem-
pa bû li Uppsala [bajerekî Swêdê ye] hebû.
Ew xwediyê Karta Şofêriyê bû lê timî bi tak-
siyê diçû û dihat, çunkî wî rê şaş dikir û hercar
wenda dibû. Carekê hinakan dît ku ew li runiştge-
hên paş ên otomobîla xwe siwar bû û got: "bajo
Unîversîteyê", lê tu şofêr li ser direksiyonê tinebû.
Ger ev yek piştî salên 2000'î bi qewimiya hingê di-
bû ku trimbêl bi xwe biçûna. Bêguman ajotina
trimbêlan di vê dema teknîka bilind de mijûliyeke
zêde ye, divê ew bi xwe herin. Li Almanya ji bo ku
trimbêl bi xwe herin, sehîti (ceribandin) hatiye ki-
rin; di Mercedes-Benzekê de 18 kamerayên video
ku rê û hawîrdorê otomobîlê giş nîşan didin hati-
ne bi cih kirin û jê agahdarî şandine Kompîtûreke
ku otomobîlê îdare dibe. Ew pênchezar kîlometre
li ser riya Almanya hêla (sur'eta) wê jî 150 km/see-
t hatiye ajotin. Qeweta kesî negihîştîyê vê barguhê-
zê (taşit, fordon) ku bikirre lê vê sehîtiyê daye xu-
yakirin ku otomobîlên bêşofêr ne zanistekê xeyalî
ye.

Bil ji vê jî hinek nûjeniyên din ên hêsayî jî hene;
Bdi nêz de wê di her tirimbêleke nû de kompîtû-
reke ajotinê hebê ku bi hertiştê rê zanibe. Ew dê
agahdarî bistîne û di heqê şimotek û riyên girtî de
înformasyonê bide, herweha dê ew li ser tifaqên
di rê de qewimî û astengiyên xirab ên rê jî agahda-
rî bide. Kompîtûreke ku diaxive dikare me di nav
bajarên nenas de jî bigerîne û fetlanek û parkên
wê bi me bidin zanîn.

Otomobîlên bihiş ên pêşerojê gellek marîfet û
hunerên wan hene; pîrr hêsa ye ku cîhazekî elek-
tronikî yê hilmkêş di tirimbêlê de bê bicih kirin da

ku dema şofêr bi araq (alkol) be nehêle otomobîl
bişixule. Çendî ku zor e jî lê ne bêimkan e ku de-
ma westandina şofêr alarim lê xe û bike orîn; her-
weha otomobîl jî şofêrê ser direksiyonê bêhtir di-
kare bi cîhazekî li der û dora xwe haydar be. Ra-
dareke bi kompîtûrê ve girêdayî kare dema nêzik-
bûna lihevketinê frênê bigire û digel vê jî ger dîsa
qeza çêbibe hingê alarmeke xweber (otomatîk) he-
re navendekê û cihê tifaqê bê diyar kirin. Ji bo ku
di tarîtiyê de tifaq çênebin dibe ku bi cihdana sist-
mekê şeva tarî jî şofêr re bibe wek naverojê. Bêgu-
man kompîtûreke baş a otomobîlan temmamê qa-
îdeyê trafîqê dizane û gava şofêr şaşî dibe alarmê
dixe. Agahdarên elektronîkî yê benda rê timî li
gor rewşa rê û rohnîyê agahdarî li ser hêlê (sur'etê)
didin. Ew, trimbêla teknîkî û békêmasî pîrr bihêl
naçe, fetlanekê bêdestûr nake, meda navbera xwe
û otomobîla pêşiya xwe li qaîde digire û nahêle ku
li cihên nebûyî bê park kirin.

Zehmetî ne di wê de ye ku trimbêlên bihiş û za-
na çêbibin lê himberiya mezin ji bo pêşerojê
derxistina otomobîlên hawîrdorparêz in. Otomo-
bîlên salên 1900'î yê bêhnibenzîn in, lê yê sa-
lên 2000'î ji bo ku otomobîlajoyî bidomîne divê
qet gemarê bernedin. Alternatîva herî baş digel ku
îro li gor teknîkê ne rast e jî, ew e ku trimbêl bi
hîdrojenê bişixulin. Mirov molekulên (nûnên) avê
perçe dibe û hîdrojenê jê çêdike ji xwe gava hîdro-
jen dişewite ew dibe buxûr. Kîmyagerê mezin
Gösta Ehrensward hêvîdar e ku mirov karibe gaza
hîdrojenê ji enerjîya ba û bahozen dora Antartîkê
derîne. Dîtîneke pîrr coşgêr e ku otomobîlên ne-
biyên me bi hêza bayê der û dorên Qutbê Başûr
bên ajotin.



Otomobîla Pîlan

Metro Renaultê nûçeyêke cihanî pêşkêş kir,
"Nekst" trimbêleke tîkel ku hem tê de motora
benzîne ya 47 bergîrbirî û pêşberkêş û hem jî li
ser her tekelekî wê motoreke elektrîkî bi 9,5
bergîrbirî û paşberkêş heye. Trimbêl, berî ku
derbasî ser motora benzîne bibe, hem di dema


sarşixulandinê de û hem jî hayanî hêla (sur'eta)
wê digihîje 40 kîlometreyî xweber (otomatîk) ji
aliyê herdu motorên elektrîkî ve tê ajotin. Ew
otomobîla ku hê wek proje ye, hêla wê digihîje
167 km/see-
t û serê milê [10 km] 0,34 litere ben-
zîn dişewitîne.

Welatparêzekî dilsoz Hemê wefat kir

Stokholm Welatparêzê dil-
soz, mirovê camêr Sidki Çelen
(Hemê), di 23'yê Çileyay Pêşîn
a 1995'an de li Swêdê, li bajarê
Stokholmê wefat kir. Hemê ji
dilê xwe nexweş bû û mirina
wî bê wext bû. Sidki Çelen bā-
vê Pelîn(11) û Sertaç (5) bû.

Ji bo Hemê di 30'yê Çileyay
Pêşîn de ji aliyê Platforma
Yekîtiya Sosyalîstên Kurdistā-
nê ve merasîmek hat organîze-
kirin û cenazeyê wî şandin
Kurdistānê.

Hemê di sala 1956'an de li
Diyarbakirê hatibû dinyayê û
piştî xelaskirina lîseyê, di sala
1973'an de çûbû Almanyayê û
li wir bi cî bûbû. Di 1976'an
de wek endamê PDK-T di nav



tevgera rizgarîxwaza Kurdistā-
nê de ciyê xwe girtibû û di sala
1981'ê de jî bûbû endamê Ko-
mîteya Navendî ya KUK'ê. Di
sala 1986'an de li gel grûbekê
ji KUK'ê veqetiyabû û piştî du
salan jî wê grûbê jî veqetiyabû.

Em redaksiyona Armançê
sersaxiyê ji malbata Hemê re
dixwazin.

Kongreya Yekîtiya Jinên Kurdistānê

Stokholm Di 23'ê Çileyay Pêşîn
de li Stokholmê Kongreya 4'em a
Yekîtiya Jinên Kurdistānê li Swê-
dê civiya. Ji 5 komeleyên jinan
24 nûner beşdarî kongreyê bûn.
Piştî xwendina rapora xebatê
munaqeshe çêbûn.

Xaleke destûrê jî di vê kongre-

yê de hate guherandin. û hejma-
rên endamên Komîteya Karger ji
7 kesan daketin 5 kesan.

Komîteya Karger a nû de ev
kes hene. Şukran Duran, Rûken
Misto, Gulîstan Altunbay, Pey-
man û Zozan

Bîranîna Cigerxwîn

Stokholm Di 17'ê Çileyay Pêşîn de
bi munasêbeta derketina kitêba
bîranînen Cigerxwîn "Jinenî-
gariya Min" li Stokholmê şevê
hat organîzekirin. Kitêb jî aliyê
Weşanxaneyay Apec û Keyo Ci-
gerxwîn (kurê Cigerxwîn) ve ha-
tiye çapkirin.


Di şevê de xwediyê Weşanxa-
neyay Apec Ali Çiftçî li ser çapki-
rina kitêbê axaftineke kir.

Nêzî 50 kesî beşdarî şevê bûn.
Di nava wan de Dr. Nacî Kutlay,



Malmîsanîj, Mahmûd Lewendî,
Ferhad Şakelî û Nasir Rezazî jî
hebûn.

Çekkirîn



Encamê Hilbijartinê

"Pirsa Kurdî çareser bikin"

Faris Can

□ % 17.63 dengên HA-DEP'ê yên Kurdistanê ji bo dewleta Tirk mesajek e ku ew pirsa Kurdî bi riyeke aşti çareser bikin

□ Li Kurdistanê HA-DEP'ê hilbijartin qezenc kir lê li Tirkîyeyê wenda kir. Li Diyarbekirê, Batmanê, Wanê, Çolemergê û Ixdîrê bû partiya yekem. Li tevayiya Kurdistanê % 17.63 û li tevayiya Tirkîyeyê % 4.2 deng wergirtin.

Li Kurdistanê HADEP bi ser ket

Bloka Aştî, Azadî û Ked ku ji HADEP, DDP, BSP û SIP pêk hatibû û ji hemû partiyên Kurdan piştgirî girtibû li Kurdistanê bû partiya yekem û % 17 deng stendin. Li Diyarbekirê, li Wanê, li Çolemergê, li Batmanê li Ixdîrê bû partiya yekemîn, li Şîrnexê, Dersimê, Rihayê, Erziromê, Mêrdînê, Sêrtê ya bû partiya duwemîn ya ji gelek deng wergirtin. Lê ji ber ku ji % 10 baraja Tirkîyeyê derbas nekir, hemû reyên wê li xaneyê Refahê hatin nivîsandin û Refah li ser piştê wê bû partiya yekemîn a Tirkîyeyê.

Lê balkeş e ku, kesên ku di şer de zerar dîtine dengên xwe dan HADEP'ê. Yan ji berê 12'ê Îlonê bajarên ku tevgera welatparêz û şoreşger lê xurt bû, HADEP'ê li wê derê deng stendin. Li Tirkîyeyê HADEP'ê zêde deng negirtin. Heta ji çar bajarên mezin yên Tirkîyeyê HADEP % 3.7 deng girtin. Ku di nav çar bajarên mezin yên Tirkîyeyê de; li Îstebolê, İzmirê û li Adanê bi milyonan

Kurd dijîn û ku nifûsa Adanê li gor waliyê Adanê % 52 yê wê Kurd in, HADEP hindik deng stend. Kurdên ku li derveyê Kurdistanê dijîn gelek ji wan dengê xwe nedane HADEP'ê û ya herî girîng bajarên ku di nav Kurdistanê de tînen hesabandin jî, ji wan gelek dengên xwe nedan HADEP'ê.


Lê ev % 17.63 dengên HA-DEP'ê yên Kurdistanê ji bo dewleta Tirk mesajek e ku ew pirsa Kurdî bi riyeke aşti çareser bikin. Herweha ev dengên Kurdan ji bo Ewrûpiyan jî mesajek e ku ew zixtê li hukûmeta Tirkîyeyê bikin da ku pirsa Kurdî çareser bikin.

Şerafettîn Elçî nehat hilbijartin

Berpîrsiyarê KDP (Platforma Demokratîk a Kurd) Şerafettîn Elçî, ku di listeya CHP'ê de li Şîrnexê bûbû namzet nehat hilbijartin. CHP'ê ne li Şîrnexê ne jî li bajarên din yên Kurdistanê tu pêşketinek nîşan neda, bilakîs dengên xwe yê berê jî wenda kir. Li Dêrsimê Alewîyên Kemalîst tenê dengên xwe dan CHP'ê. Bajarê ku Şerafettîn Elçî namzet bû, DYP'ê 2 mebus ANAP'ê jî mebusê derxist. Herçiqas namzetê DYP ji malbata Tatar bû û korucî bûn HADEP li Şîrnexê bû partiya duwem, ji ber ku baraja Tirkîyeyê derbas nekir dengên wê çûn ji DYP'ê re.

Partiya ku Elçî li Şîrnexê namzetê wê yê meclîsê bû, 6000 deng wergirt. Ev jî nîşan dide ku êdî li Kurdistanê dewra CHP xelas bûye, Şerafettîn Elçî xeletiyê weha kir ku êdî hevalên wî jî belkî nikaribin wî biparêzin. Siyaset ne ew e ku meriv illahî bibe parlamenter û dûre karûbarê xwe bimeşîne.

Dengên Partiyên



RP bû partiya yekem

Di hilbijartinê gîştî ya 24'ê Çileyâ Pêşîn de partiyên rast bi ser ketin. Partiya yekem Partiya Refah a Necmettîn Erbakan bû ku sloganên duzêna adil û dîtinên milî kir bingeha propagandeya xwe ya hilbijartinê. Erbakan di kampanya xwe ya hilbijartinê de li hember hemû partiyên din xebat kir, ew wek partiyên duzênê îtham kirin, li hember endamtiya Tirkîyeyê a Yekîtiya Gumruka Ewrûpayê sekinî, motîvên dinî û çepîti kir bingeha propaganda xwe. Li Anadolîyê û Kurdistanê herî pir deng stend. Cara pêşîn li Îstebolê herî pirr parlamenter xist meclîsê û li Kurdistanê dengên HADEP'ê hemû ji wê re çûn û bi vî hawî bi % 21.3 dangan 158 parlamenter derxistin û bû partiya yekem.

DYP û ANAP wek hev in

Partiyên rast yê merkezê ANAP a Mesûd Yılmaz û DYP a Tansû Çiller li hember hev kampanya-ke tûj meşandin û him jî li dij Partiya Refahê sekinîn. Herçiqas anketên raya gîştî berê hilbijartinê Partiya DYP a Çiller dixistin partiya 4'em jî, lê DYP di hilbijartinê de herî bi qezenc derket. Ji ANAP'ê niv prosent kêmtir deng stendin, lê ji wê zêdetir mebus derxistin. Çiller di propaganda hilbijartinê de xwe û partiya xwe hevdem da nîşandan, endambûna Tirkîyeyê a Yekîtiya Gumrugê kir bingeh û li dijî PKK'ê û Yûnanistanê sekinî ku xwedigiravî ew li hember endambûna Tirkîyeyê a Yekîtiya Gumrukê sekinîne. DYP li herêmen Ege û Marmarayê herî pirr deng stend, li temamê Tirkîyeyê % 19.2 dangan girt û 135 parlamenter derxistin.

ANAP'a Mesûd Yılmaz herçiqas bi dangan bû partiya duwemîn jî, lê ji DYP'ê hindiktir mebus şandin meclîsê. ANAP partiya muxalefetê bû û di hemû hilbijartinên xwe de li dij DYP'a Çiller propaganda meşand. Partiya Refah ji xwe re kir raqîbê yekem lê gelek namzetên wê berê wek alîgirên Refahê dihatin nas kirin. ANAP'ê bi partiya paşverû ya BBP a Muhsîn Yazıcıoğlu re tifaqa hilbijartinê kir. Bi vî hawî him Muhsîn Yazıcıoğlu û çend hevalên wî hilbijart him jî reyên xwe zêde kirin.

Lê netîceya hilbijartinê nîşan dide ku ew dîsa jî bi ser neket. Li bajarê Îstebolê di hilbijartinê berê de 32 mebus derxistin û çar hejmara mebusên wê daket 15'yan. Herî pir li herêma Bahra Reş deng wergirt. Li temamê Tirkîyeyê % 19.6 dangan girt û 131 mebus derxistin. Vê hilbijartinê jî nîşan da ku ew herdu partî him wek alîgir û him jî îdeolojî wek hev in û terefdarên wan jî eynî kategorî ne. Lê ji ber serok û rêvebirên van partiyên, ew nikarin bibin yek.

CHP'ê bi DSP'ê re cî gûherand

Partiyên Kemalîst DSP a Bulent Ecevit û CHP a Deniz Baykal li Tirkîyeyê ku wek partiyên çep tînen xuya kirin; DSP % 14.6, CHP % 10.7 dangan girtin. Herduwan bi hev re ne qasî ANAP û ne jî qasî DYP'ê mebus derxistin. CHP a ku Atatürk danîbû di vê hilbijartinê de hindik mabû barajê derbas neke. Lê bi "niv prosentî" dîsa 49 mebus derxistin. Berê hilbijartinê dema namzetên partiyên hatin destnîşankirin, ji CHP'ê gelek kes veqetiyabûn û çûbûn DSP a Ecevit.

Û ji aliyê din CHP'ê bi bê îstikrariya seroktiya xwe û koalîsyona bi DYP'ê re tesîrek nebaş li alîgirên xwe kir. Li DSP ji CHP'ê zêdetir dangan bistine. Li Kurdistanê dengên CHP'ê çûn HADEP'ê.

Ya herî baştir ne CHP'ê û ne jî DSP'ê li Kurdistanê deng nestendin. Ecevit li herêma Trakyayê, Baykal jî li herêma Derya Sipi herî pir deng wergirtin.

MHP'ê derbas nekir, YDH'ê raya gîştî şaş kir

Partiya MHP a Turkeş di hilbijartinê 91'ê de bi tifaqa a bi RP'ê re ketibû meclîsê. Di vê hilbijartinê de bi serê xwe ket hilbijartinê û % 8.2'yê deng stend lê wê tîrê nekir ku barajê derbas bike. Herçiqas MHP îdeolojiya faşîst ji xwe re kiribû bingeh jî, lê van salên dawiyê di bin siya DYP'ê de siyaset dikir û di Meclîsê de piştgirîya wê dikir. Lê wer xuya ye ev partî hîn jî di nav gel de xurt e.

YDH a Cem Boyner ku wek tevgera tevgera liberal e, lê bi hin kirinên xwe ji partiyên din yê sistemê cûdatir e û di derheqê pîrsa Kurdî de mesajên cesûr dide jî, di hilbijartinê de gelek gelek hindik deng stendin. Li temamê Tirkîyeyê nêzî 140.000 deng girtin û di % 0.5 de ma.

MHP'ê objektîf li dijî tevgera Kurd e, lê YDH'ê li gel Kurdan politika kir. Di netîceyê de, herdu partî jî barejê derbas nekirin. Ev tê wê manayê ku gelê Tirk ne bi vê siyaseta wan re ye.

Li Tirkîyeyê dengên MHP'ê ji DYP'ê re û li Kurdistanê jî dengên YDH'ê ji HADEP'ê re çûn.

D

Devrimci

D

Doğu

K

Kültür

O

Ocakları

Zinar Soran

Komeleyên Çanda Şoreşgerî yê Rojhilatê



Hin endamên DDKO di girtîgeha Diyarbekirê de (1973) Ji milê çepê, yê piya: Alî Beykoşlu, Alî Yılmaz Balkaş, Fikret Şahin, İbrahim Guçlu. Ji milê çepê, yê rûniştî: Battal Batê, Mumtaz Kotan, Mahmut Kiliç, Yumnu Budak (Di Îlona 1995'an de wefat kir)

zên Kurdan rewşeke nû çêkir. Li Tirkiyê gelek komele, sendîqa û rêxistinên nû hatin ava kirin.

PDKT û KAK

Di wê demê de, gelek xwendekarên Kurd li metropolê di zanîngehan de dixwandin. Piştî berdana girtiyên siyasî yê Kurdan, rewşên bîr, xwendekar û welatparêzên Kurdan hem bi dizî û hem jî eşkere xebat û têkoşîna xwe ya neteweyî û şoreşgerî geş kirin. Çend welatparêzên Kurd, di sala 1965-an de, bi awakî îlegal Partiya Demokrat ya Kurdistanê Tirkîyê (PDKT) damezrandin. Piştî damezrandina wê partiyê, di sala 1967-an de jî çend xwendekarên Kurd di sa bi awakî diî û îlegal Koma Azadiya Kurdistanê* (KAK) damezrandin. Damezrandina PDKT bû destpêkeke nû ya ku welatparêz û rewşên bîrên Kurdan bi nasnameya xwe ya neteweyî rêxistinên xwe yê siyasî û serbixwe ava bikin. Lê PDKT di giranîyê de ji rewşên bîrên ji mederseyên olî û gundiyan welatparêz pêk hatibû. Gelek rewşên bîr, xwendekarên şoreşger û çep di nav vê rêxistinê de cih negirtibûn. Piraniya rewşên bîr û xwendekarên Kurdan yê çep û welatparêz di nav Partiya Karker ya Tirkiyê (TIP) û Federasyona Qulûbên Ramanê (FKF) de dixebitîn. FKF piştî re bû Federasyona Ciwanên Şoreşger (DEV-GENÇ).

Piştî cûntaya leşkerî ya 27-ê gulana 1960-î efûyeke giştî hate derxistin. Ji derveyî girtiyên siyasî yê Kurdan ku bi navê 49-an dihatin naskirin, girtîgehên Tirkiyê hatin vala kirin; girtîgeh li ser hesabên girtiyên siyasî yê rewşên bîr, xwendekar û welatparêzên Kurdan man. Piştî vê efûyê bi demê, rewşên bîr û welatparêzên Kurdan jî ji zindanê derketin. Qanûna bingehîn ya 1961-ê nisbî be jî di warê azadiya ramanî de, bînfirahiyeke berbiçav anî holê; ji bona tevgera çep ya Tirkiyê û xebat û tevgera neteweyî ya rewşên bîr û welatparê-

rewşên bîr û xwendekarên Kurdan, di nav komele û rêxistinên çepê Tirkiyê de jî nasname û pirsê kurdî roj bi roj bêtir dixistin rojeva gotûbêjan. Ne bi awakî programkirî û sistematîk be jî ew di nav van komele û rêxistinên de ber bi grûbiyê ve diçûn. Di nav xwendekar û rewşên bîrên Kurdan de jî, bîr û bawerîya avakirina komele û rêxistinên serbixwe bêtir belav dibû. Di warê lênerîna li ser nasname û pirsê kurdî de, her ku diçû xeta di nav welatparêz û şoreşgerên Kurd û Tirkan de qalindtir dibû.

Piştî demê, hinek rewşên bîr û xwendekarên Kurd yê ku di nav rê-

xistin û komeleyên çep yê Tirkan de dixebitîn jî gihîştin wê baweriyê ku êdî bi xebata di nav rêxistin û komeleyên çepên Tirkan de, wê pirsê kurdî zêdetir pêş ve naçe û loma jî divê ew komele û rêxistinên xwe yê serbixwe ava bikin. Ji bo vê armançê jî rewşên bîr, xwendekar û welatparêzên Kurdan dest bi hevdiyan û civînan kirin. Di 5-ê gulana 1969-an de li salona Komeleya Xwendekarên Akademiya İktisad û Ticaretê ya Ankarayê 21 xwendekar û rewşên bîrên Kurdan dicivin û ji bona avakirina komeleyek xwendekarên Kurd dest bi gotûbêjan dikin. Piştî vê civînê, bi vê armançê çend civînan din jî çêdibin (1).

Di derheqê wê demê û damezrandina DDKO de, Ümit Fırat weha dinivîse:

TIP û FKF

“Piştî damezrandina Cumhuriyetê, Kurdan bi nasnameya xwe ya neteweyî di tu rêxistineke siyasî û kulturî yê eşkere de nikaribûn xebat û çalakiyekê nişan bidin. Teva ku Qanûna bingehîn ya 1961-ê di warê bikaranîna wê nasnameyê tu serbestî neanibû jî di pratîkê de, salên 1960-î bûn salên hejandina van tatbîqatan. Bi damezrandin û hûnandina rêxistinî ya “Türkiye İşçi Partisi” (TIP) gelek rewşên bîrên Kurd û siyasethanên herêmî bi aktîfî ketin nav vê xebatê û dest bi têkoşîneke siyasî kirin. Gelek xwendekarên Kurd yê universîteyî hem di nav şaxên rêxistinê TIPê de, hem jî di serî de Federasyona Qulûbên Ramanê (FKF) di nav komeleyên ciwanan yê pêşverû û cûrbecûr de cih girtin. Lê van kesan, teva ku di qanûnê de piştê jê re tunebû jî, di pratîkê de û bi taybetî di nav TIPê de bi nasnameya xwe ya neteweyî xebatên xwe dimeşandin. Bê ku ew di nav xwe de xwediyê platformeke siyasî ya alternatîf bin jî, ew ber bi gurûbiyeke jiberxweyî ve diçûn. Ji ber hinek zîrarê qanûnî, di dewsa ku ji wan re bibêjin ‘gurûba Kurdan’, digotin ‘gurûba Rojhilatîyan’. Ev grûb, ji bo

Kurdan bûbû navendiyeke girîng û meydana tevgerê”.


Ümit Fırat, bi dû re li ser Kemalîzmê, tesîra wê ya li ser çepê Tirkan, gotûbêjên siyasî û îdeolojîk yê bi awakî giştî* di nav çepê Tirkan û bi taybetî di nav TIPê de, helwestên wan yê li ser şîrove û ravekirina serîhildanên Kurdan radiweste û weha didomîne:

“Bê guman li hemberî tevgerên çep yê ku xwediyê adet û bîr û baweriyên weha, Kurdan jî bê ku bi derengi kevin fêhm kirin ku bi vê bîr û baweriyê pirsên wan nayên rave kirin. Bi awakî giştî Kurdan û bi taybetî Kurden 1968-îyan hîs kirin ku pirsên wan di nav rêxistinê ku hene de bi qasî ku pêwîst e, nayên gotûbêj kirin û nagihêjin civatê. Ew jî vê rewşê aciz û nerehet dibûn. Ji aliyekî alîgirên Şoreşa Sosyalîst (SD), ji aliyê din jî alîgirên Şoreşa Neteweyî û Demokratîk (MDD) dest bi gotûbêjên sratatejîk kirin. Lê di van gotûbêjan de, wan li ser Kurdan û pirsê girêkên wan tu projeyên berbiçav pêşve nedixistin.


Şoreşgerên Sosyalîst, ev pirsê pirsêke îqtidarê diditin. Çareserîna wê jî davêtin ber deriyê çîna karkeran. Li gor wan, eger ji bo Rojhilatê Anadoluyê bikaribe programeke têr ya aborî bête meşandin, pêşîya qanûna pêşketina newekheviyê bête birîn, weke hemû pirsên ku hene, wê ev pirs jî bi çareserîna aborî bête çareser kirin. Mesele bi meşandina siyaseteke adalî û wekhevî ve girêdayî ye.

Li gor Şoreşgerên Neteweyî û Demokratîk jî, eger Komara Tirkiyê ji bargêhên biyanî yê NATO-yê, ji sermayeyê biyanîyan, ji axa û şexan bête paqij kirin, wê pirsê girêk jî bêne çareser kirin...

Li hemberî bîr û baweriyên ku kês û firsend nedidan îfadekirin û gotûbêjên hemû tiştan û geşkirina hêviyên xweş, ciwanên Kurdan teva ku ne xwediyê teoriyeke pêşde bûn jî bi teorî û tecrûbeyên xwe yê ku hebûn têgihîştin ku pêwîstî bi avakirina rêxistinîyeke serbixwe heye. Bi vî awayî,



Serokê DDKO ya Îstenbolê Necmettin Buyukkaya
(1943-1984)



Endamê DDKO Mehmet Sozer
(1939-1986)



Endamê DDKO'ya Silvanê Muhterem Biçimimli
(1948-1978)

van dest bi damezrandina DDKO yên ku li dîrokê de xwediyê cîhekî girîng in, kirin" (2).

Li gor agahdariyên ku Ibrahim Güçlü lide, piştî rewşa xwendekarên Kurdlan yên ku di nav TIPê û komeleyên şoreşger yên Tirkan de kar dikirin, li Ankarayê û Stenbolê gihîştin wê baweriyê ku dêwîstiya rêxistineke serbixwe û eşkere ya Kurdî heye, ji niha şûn de bi çep û şoreşgerên Tirkan re xebata rêxistinî ya hevbeş vê pîrsa kurdî zêde pêşde nexine; dest bi cebatên damezrandina DDKO kirin. Di damezrandina DDKO de, rewşenbîr û xwendekarên çep û şoreşger pêşengî dikirin. Piştî, ew rewşenbîr û xwendekarên curdparêz yên ku di tu rêxistinên Tirkan le cih negirtibûn jî beşdarî navê xebatê şûn. Ew Kurdparêzên serbixwe yên ku di damezrandina DDKO de cih girtibûn, zêdetir ji derdora Partiya Demokrat ya Kurdistanê Tirkîyê (PKDT) û Koma Azadiya Kurdistanê (KAK) dihatin.

Ji bona damezrandina DDKO, pêşî li Ankara û Stenbolê komîteyên danûstendî lê hatin ava kirin. Komîteyan bi hemû keşên ku dixwestin rêxistineke kurdî bête ava kirin re, peywendî danîn. Ji bona damezrandina DDKO damezrenêr hatin tespît kirin. Ew kesên ku weke damezrenêr hatibûn tespît kirin, li Ankara û Stenbolê li paralelî hevdu de xebat û haziriyên xwe lîmeşandin. Ji bona destûra van komeleyan û çarçeweyêke programê bête tespît kirin, komeke taybetî ku pîraniya wê ji kesên damezrenêr pêk dihat, hate hilbijartin. Vê grûbê, bi hinek kesên çep û şoreşger yên ku bi pîrsa kurdî re ji nêzîk ve elejeder dibûn jî dan û stendin çê kirin. Di hincama vê xebatê de, destûra DDKO û di çarçeweya programekê de, nivîseke li derlora 40- 50 rûpelan hate amade kirin. Di vî nivîsê de, li ser dîroka neteweyê Kurd, rewşa siyasî ya Rojhilata Navîn û Dinyê, rewşa civata Kurd ya wê demê, daxwaza xelê Kurd, sedemên damezrandina DDKO hatibû rawestandî (3).

Di damezrandina DDKO ya Ankarayê de roleke taybetî ya havalên KAKê çêbû. Ji bo avakirina komeleyêke xwendekarên Kurd însiyatîfê hevbeş hatiye çêkirin. Di nav vî însiyatîfê de hevalên KAKê jî bi

aktîfî xebitîne. Ev însiyatîfa hevbeş bingehê xebata avakirina DDKO ya Ankarayê hûnandîye. Ger ew însiyatîfa hevbeş nehatiba çêkirin, dikaribû DDKO ya Ankarayê nehatiba ava kirin; ya jî tîketa bin nîrê hinek Kurdên ku di nav TIPê de dixebitîn. Ji xwe, TIPê dixwest ku xwendekarên Kurdan di binê însiyatîfa wê de bimînin (4).

I-DAMEZRANDINA DDKO

DDKO ya Ankarayê:

DDKO ya pêşî li Ankarayê hate damezrandin. Destûra DDKO ya Ankarayê di nivê meha gulana 1969-an de hate amade kirin. Di serokatiya Yümnü Budak de daxwaznameya vekirina vî komeleyê bi awakî resmî hate kirin. Li gorî qanûna komeleyan, ev destûr di 24-ê gulana 1969-an de di rojnameya "Medeniyet"ê ya Ankarayê de hate weşandin. Bi vî awayî DDKO ya Ankarê bi awakî fermî hate damezrandin. Serokê DDKO ya Ankarayê Yümnü Budak bû. Hinek birêvebir û endamên komeleyê jî Deham Keleş, Ibrahim Güçlü, Hikmet Buluttekin, Kemal Cengiz, Ahmet Kotan, Şerif Felekoğlu, Nusret Kılıçaslan, Abdullah Soysal, Ali Beyköylü, Salih Sitki, Mustafa Karacadağ, Nazmi Onur, Halit Çetinyalap, Mustafa Karadağ, Mümtaz Kotan, Mehmet Demir, Halil Dünder, Nuri Bingöl, İsa geçit, Mehmet Sait Aktaş, İrfan Özen, Bedri Demir û Faruk Aras bûn.

DDKO ya Stenbolê

Piştî damezrandina DDKO ya Ankarayê bi demeke kurt, daxwaznameya vekirina DDKO ya Stenbolê hate kirin. Destûra DDKO ya Stenbolê di dawiya gulana 1969-an de, di kovara "Türk Solu" de hate weşandin û bi awakî resmî dest bi xebata xwe kiriye. Serokê DDKO ya Stenbolê Necmettin Büyükkaya bû. Hinek berpirsiyar û endamên wê jî Hikmet Bozçalı, Ali Haydar Emre, Mehmet Can, Leyla Ejder, Mehmet Tüysüz, Sabri Ünlü, İbrahim Önen, Fevzi Yardımcı, Ömer Bakal, Mahmut Kılıç, Ali Buran, Aydın Yümlü, M.Ali Aslan, Aziz Yılmaz, Sait Bozgan, İbrahim Yüksekaya, Kadir Ak-

güneş, Mustafa Doğan Özbay, Fazlı Can, Ahmet Zeki Okçuoğlu, Salih Kaynak, Mehmet Balamir, Sait Pektaş, Agah Uyanık, Şakir Elçi, Ali Yılmaz Balkaç, Kadri Çağlı, Hüseyin Azkan û İlhami Yaban bûn (5).

DDKO ya Erganiyê

Di 13-ê çirya paşin ya 1970-yî de DDKO li Erxenyê hate damezrandin. Endamên damezrenêr yên DDKO ya Erxenyê ji van kesan pêk hatibûn: Ömer Kan, Mehmet Emin Tektaş, Kemal Vural, Mustafa Gök û Mehmet Sağlamoğlu.

DDKO ya Silvanê

Piştî damezrandina DDKO ya Erganiyê, di 9-ê çileyê paşin ya 1970-yî de DDKO li Silvanê hate vekirin. Endamên damezrenêr yên DDKO ya Silvanê ev kes bûn: Bahri Evliyaoğlu, Mahmut Okutucu, Muhterem Biçimli, Vedat Erkaçmaz, Akif Işık, Abdülkerim Ceylan, Yusuf Kılıçer, Mahmut Yeşil, Cüneyt Ceylan, Zeki Bozarslan û Fikri Müjdecî.

DDKO ya Kozluk (Hezo)

Di 28-ê çileyê paşin ya 1970-yî de, DDKO li Kozlukê hate damezrandin. Endamên damezrenêr yên DDKO ya Kozlukê ji van kesan pêk hatibûn: Mehmet Şirin Baltaş, Alaattin Baltaş, Abdi Dizmen, Yusuf Güzel, Mehmet İnal, Halil Kaneş, İrfan Bozgil, M. Tahir Birlik, A. Halim Dinler, Mehmet Asker û Nasir Bağdı.

DDKO ya Diyarbekirê (Amed)

DDKO li Diyarbekirê di 6-ê çileyê paşin ya 1971-ê de hate damezrandin. Endamên damezrenêr yên DDKO ya Diyarbekirê ji van kesan pêk hatibûn: Yusuf Ekinci, Süleyman Çelik, Fikri Gürbüz Yıldızhan, Ömer Çetin, Mehdi Zana, Nazım Sönmez, Abdurrahman Uçaman, İlhan Aslan, Vedat Hayrulloğlu, Giyasettin Ayaz, Halit Ayçiçek, Hasan Yılmaz, Hüseyin Altan, Tarık Ziya Ekinci, Naci Kutlay, Sadun Kılıç û Mehmet Canpolat.

DDKO ya Batmanê

DDKO ya Batmanê di 18-ê çileyê paşin ya 1971-ê hatiye damezrandin. Ev

DDKO-ya dawî ye û piştî DDKO ya Batmanê tu DDKOyên din nehatine ava kirin. Endamên damezrenêr yên DDKO ya Batmanê ev kes bûn: Mehmet Yıldız, Ubeydullah Aydın, Sabri Yıldız, Mehmet Durmaz û Sabahattin Saygılı.

Bi vî awayî pêvajoya damezrandina DDKO ku di gulana 1969-an de bi damezrandina DDKO ya Ankarayê dest pê kiribû, bi avakirina DDKO ya Batmanê dawî lê hatibû (6).

Têbînî û çavkanî

* Di derheqê vî rêxistinê de nivîskar dê di hejmarên pêş de agahdariyên hîn firehtir bide.

(1) Ji bo behsa van civînan û kesên ku beşdarî civînan bûnin, binêre: Devrimci Doğu Kültür Ocakları Dava Dosyası, Komal Yayınları, r. 40.

(2) Ji bo tevayê nivîsa Ümit Fırat binêre: Sosyalizm ve Topumsal Mücadeleler Ansiklopedisi, İletişim yayınları, Stenbol, 1988, cild: 7, r. 2118-2119.

(3) Ji agahdariyên taybetî yên Ibrahim Güçlü. Hevalê Ibrahim Güçlü, hinek agahdariyên ku li ser damezrandina DDKO mîna jê xwestibû, di 28-ê çileyê paşina 1995-an de bi awakî nivîskî amade kir.


(4) Ji agahdariyên taybetî yên hevalên KAKê.

(5) Tarîxa damezrandina komeleyên DDKO, serok û endamên destpêkê li gor agahdariyên Dr. Ibrahim Etem Gürsel hatiye nivîsandin; lê di vî warê de, ji hinek hevalên ku di wê demê de endamên DDKO bûn jî hatiye pirsîn. Li gor agahdariya ku Eyyüp Alacabey dide, Emin Kardeşin jî yek ji wan endamên damezrenêr yê DDKO ya Stenbolê bû. Eyyüp Alacabey di kongreyê sêyem ya DDKO ya Stenbolê weke endamekî komîteya karker hatibû hilbijartin û sekreterê dawî yê vî komeleyê bû.

Ji bona behsa damezrandina DDKO binêre: Dr. Ibrahim Etem Gürsel, Kürtçülük Gerçeği, r. 88-91.

(6) Ji bo behsa damezrandin û hinek xebatên DDKO binêre: Dr. Ibrahim Etem Gürsel, Kürtçülük Gerçeği, r. 85-99.

Vedat Şadili, Türkiye'de Kürtçülük Hareketleri ve İsyanlar, Kon yayımları, Ankara, 1980, r.274-288.



Bi karîkatoran hîbijartin




Ma gelo wêneyên ku bi vî awayî hatine afirandin; dikarin, wisa ji nişkê ve, bibin şahîd û çavderên bîr û hişê vê serdemê, yan jî dikarin ast û sewiyeta çendeyî û rewşenbîrî ya vê sedsala me yî tevlihev û ji hevketî, destnîşan û sînor bikin?!

Wexta ku pênuş an jî perîka hunermendekî bîrtûj û rastgo di nav hestên tenik ên dahênanê de dorpêç dibe û bixwaze lawazî û çewtiyên jiyane eşkere bike; wê wextê pênuşa wênekêş û risimkêşan ber bi asoyên sipehîbûn ve radikîşe da ku me agahdarî sosret û şikestin û têkçûna mirovayetiye bike. Matmayîn hildiperika koşeyên dil û lêvên zuha di sihra xêzan de winda dinin, çav jî rengvedanê bewer nakin.

Li beramberî van her şeş karîkatûran dê yê temaşevan hînî çend şeweyên wergirtina kêlikên sexte yên jiyana siyasî û rojane biben. Kurtkirina felsefeya hunerê di xêzên dînbûyî de cî dibin... Surdarî li ser hinarkan geş dibe...

Xwe bi xwe dê yê temeşevanan bibêje: Ne xwe rastiya vê xirecîrê, vê pevçûnê, ne xwe formên cihêreng û yekreng ên desthilatdarî û zorbaziyê; dê bi vî awayî me bi xwe re ji bo pêşerojê amede bikin? Amedekirina bê ango "bê mane" ya ku di pirsên gumangir de bi cî bûye, dê bikaribe me hînî têgiştina rastiye bike?

Ehmed Huseynî




"Pêşwazî"

Barbe

Barbe

Di sala 1936'an de li Fransayê ji dayik bûye. Di kovar û rojnameyên "Le mond", "Polîtîk" û "Hakîrî" de karên hunerî dike. Albuma wî bi navê "zemîn bo zemîn e" derçûye.




Cemawer û namzed

F. Dogan

Di sala 1932'an de li Istenbolê ji dayik bûye.

Di sala 1956'an de wek risimkêş di kovarên ciwanna de dest bi kar dike. Çend albumên wî hatine çapkirin. Beşdarî gelek pêşengehê navneteweyî bûye.




Sindoqa hilbijartinê

Forges

Forges

Di sala 1942'an de li Madrîdê ji dayik bûye. Di gelek kovar û rojnameyên Îspanyayê de wek hunermend dixebite.




Desthilatdarî

Fiora

Fiora

Li Nemsayê, li başûrî Tîrolê ji dayik bûye. Di navbera salên 1942-1944 akademiya hunerî dixwîne. Her heftî di rojnameya Die Zeit li ser babetê siyasî karîkatorêk wî çap dibe.



Gereke namzetan

Chaval

Chaval

Li Fransayê li bajarê Bordoyê di sala 1915'an de hatiye dinê. Nivîsskar, hunermend û senarîst e. Di kovar û rojnameyên Fransayê de "Figaro", "Figaroya Wêjeyî" û "Noval Opsirvator" karîkatorên wî tîn belav kirin.



Amadekirina namzetan

Hans Haem

Hans Haem

Li Balê (Swisre) di sala 1929'an de ji dayik bûye. Li Londonê, li Parîsê û li Awusturyayê di kovar û rojnameyan de xebitiye.

Wezîrê Zindanê

Çîrok

Kamil Geylanî

Beşa Yekemîn

1- Fermandarê Hindî

Di heyamek ji heyamê berê de fermandarê Hindî yê pir sitemkar î dilqewî jiyaye. Di wê demê de hin walî û desthilatdarên gelek bajar û herêmên Hindê yên bi hezaran kes tê de jî serî ji vî zordarê xedar î torr re ditewandin. Wan waliyan nikaribû ne ji gotina wî û ne jî dijî fermana wî derkevin.

Wî zorbayî çiqas ev sernermî û fermanberiya çavgiştî ji wan didit hê bêhtir çavsor dibû, vê çavsorî û zordestiya wî jî ew zahftir ber bi çewtiyan ve dibir û her ku diçû zor û kotekiya xwe zêdetir dikir. Dem û dewranê wextekî dur û dirêj destûr dayê û pê re rast hilanî. Ji wê bûnê jî di dilê wî de sêwirî ku ew ji çewtiyan berî ye; ew şaşî, qelpî û tewşiyên ku kesên din dikevinê ew ti carî nakeve wan.

2- Wezîrê Dadmend

Eger rewş sipartî wî torebazê terribî bûna, bêguman wê di demê kurt de fermandariya wî bihejiya, û textê wî bileriziya. Çiku heçî dad ku heye bingeh û asasê mezinafî û serokatîyê ye, lê çêreya bitrî û terribînê jî wextm û xirabûn e.

Lê belê su'ûd û îqbala wî Fermandarê Zordar hebû ku wezîrê wî yê dadmend î pêbawer, bi navê Sila, hebû. Li kêleka wê dadmendiya xwe ew hem mihrîvan û hem jî dûrbîn bû, pêşeroja xwe qenc didit. Ew xweyrayeke payebilind û tevdiroke rind î heja bû, ji bextewariya gel û parastina welêt ji neyaran pê ve li tişteki din nedifikirî. Wî zikreşî û ehmeqiya (bêhişiya) xwendkar bi zîrekî û serwestiya xwe wenda dikir û bi çeknasî û şarezayiya xwe dibû asteng ji bo hoviyên wî sitemkarî.

3- Durustiya Wezîr

Fermandar bi çêyîya wezîrê xwe dizanibû; wî jî bo çareserkirina pîrsîgîrêkên dewletê, rastiya tev-

dîr û dîtînen wî yên qedirbeha didit. Ji wê bûnê jî wî pir jê hiz dikir û baweriya xwe pê dianî; ew timî bi Wezîr dişewirî, lê qenc guhdarî dikir û nedida ser gotina wî. Ji ber vê yekê padişah gelek perû û diyariyên heja jî dabûnê. Gel bi xwe jî li ba xwe cihekî bilind dabû wezîr û durustî û dadmendiya wî û xuyên wî yên esilzadeyî bi qencîrîn pesnî dipesinand.

4- Şîretên Sila

Di dawiya rojên xwe de Sultan serê xwe qenc tevî hev kiribû û hovîtiya wî hê zêde lê zor kiribû. Ji ber wan kirînen wî yên kirêt û kotekiyên wî yên zahf, Wezîr jî jê westiyabû û hew dikaribû pê re bidomîne. Wezîrê me bi jîrî û nêrîntûjiya xwe encama çewtiya wan zagonên zordariyê yên nû ku paşa fermana deranîna wan dabû, qenc didit. Ew bêgav dima ku serwerê xwe bi wan tadeyî û encamên pîs ku wî bi nik xwe ve dikişînin, bihisîne.

5- Xezeba Zordarî

Wezîrê me bi şîretên xwe yên rast, çewtiyên serwerê xwe her diyar dikir û ji raçavkirina wan dûr nediket, ta ku kerba wî ya mezin rabû. Wî bi cezakirina cezayê herî giran gef li Wezîr xwar ku divê ew kêmasî nexe pêkanîna daxwaziye wî û gefa xwe weha kuta kir:

– Pêwîst e tu her daxwaziya min bi cih binî û bê ser û çav di ber emrê min de bî; ger na nexwe te xwe ji bo kîn û xezaba min çikandiye.

Wezîr rastiya gef û gurrên mezinê xwe qenc dizaniya û dîsa wî zanibû ku xwendkar di bîcanîna kotekiyên xwe de qet dudiliyan jî nake. Lê tevî wê jî wî zanibû ku ketina nav fermanên padişah ên tadeyî û zordestiyê, wê bibe sedemê derbaskirina temamê jiyana wî di dilêşî û poşmaniye de. Heyanî ku sax be dê wujdanê wî biêşe û dê ew wî bi erçiqîne; ji vê bûnê jî wî rabû di şûna jana dil de mirinê ji xwe re hilanî.

6- Çavtirsandina Paşî

Ji ber rik û serhişkiya Wezîr hêrs û xezeba Padişah jî bêhtir bû û qîrek da parêzgerên xwe. Bi qîra wî re ew bi lez hatin û li berî pate birin, piştê Padişah li Wezîr fitilî û bi gef bala wî kişand:

– Ez a niha berî perçiqandinê fersenda dawî didim te. Lê ku ev keysa dawî jî ji destê te bifilite êdî tu qet yeke weha nabînî. Çimkî çendî tu li vê rika xwe bikudîrî tu dê mirinê bi çavê serê xwe bibînî. Niha êdî bêje, ma tu pêkanîna her daxwaziye min dipêjirî yan na? Wezîr Sila serê xwe, bi rik û hêrs, ji bo nanakirina fermanê serokê xwe hejand û rakir. Hingê Sultan di cih de li pasvanan kir qêrîn û got:

– Bi lez werin vî xayînî bigrin û bavîjin burca bilind ya telefbûnê. Da ku ew li wir, di bin kekelê û qêleqiya germa tavê de rojên xwe yên dawî bê nan û av derbas bike û cezayê vê serhişkiya xwe bi mirina ji ti û birçîna bide.

7- Heyrîmayîna Parêzgeran

Parêzger li ser vê rewşê şaş û matman; wan nizanibû ka wê çî bîkin û ji wê bûnê jî ew hêdî hêdî û dudil ber bi Wezîr ve diçûn. Wan cihê Wezîr ê girîng dizanibû û jî bîr nekiribûn ku wî bi salan, li ser navê Sultan, fermandariya welêt kiribû û piştî Xwendkar di bajêr de, ew mezintirîn mirov bûye. Her weha wan dadmendiya wî ji gel re û mihrîvaniya wî ji bo qels û tawanbaran jî qenc dizanî, ji ber vê yekê jî yekî ji wan nediwêribû destê xwe bidinê û nedixwestin ku bi ser ve jî herin. Lêbelê Wezîr bi gotineke aramwarî ew ji wê şaşî û dudiliyê rizgar kirin û ji wê keser û kedera di dilê wan de jî filitandin:

– Gelî qencên pêbawer, qet pa-xava mekin, xwe neêşînin û bira dilê we jî neqilqile! Bêşik ez we ji bo girtina xwe bêgav nahêlim. Ji bo pêkanîna viyana mezinê me Sultan, va ye ez bixwe di pêşiya we de diçim burca telefbûnê.

Piştê Wezîr di nav milên pas-

vanan de ji dîwana Sultan derket, bi aramî û dilbicih li pêşiya wan bêrawestan meşa xwe domand û bi serbilindaiyeyeke bi rûmet kişiya. Dilê wî, piştî pêkanîna erka xwe, bi awayekî baştirîn tije kêf û şadî bûbû.

Beşa Duyemîn

1- Mêrxasiya Sila

Wezîr Sila, ji tadeyiyên ku di burca telefê de li pêşiya wî ne haydar bû û ew ji mirin û nefilitandina temamê kesên ku di vê burcê de hatine zindankirin ne bêxeber bû. Ew jî nêzikiya ecelê xwe û zûçûyîna bi bal dinya wî alî ve qenc dilbicih bû. Hem wî qenc zanibû ku ew bes yan mirî jî wir derdikeve yan jî bi saxî di wir de tê veşartin. Lêbelê tevî vî awayî jî, wî tişteki jî tirs û bihta xwe nîşan neda; belkî hê bêhtir bi semax û aramî xwe siparte emir û fermana Xwedê.

2- Jina Wezîr

Wezîr demêke dûr û dirêj li ser sawîr û talûkeyên pêşiya xwe fikirî; paşî hişê wî feneke wer heja ku mîna tîrêjêke rohnîyê leylan dide, anî bira wî. Wî qenc bawer kir ku ger ew di vê gerrefena xwe de bi ser keve dê ew ji wan xeterên vê burca bêoxir bê parastin. Ji bo pêkanîna vî planê baş î hevîdar jî ji jina wî çêtir ti hevlekî wî yê pêbawer tunebû.

Yek ji nobetdarên bi dilxwazî fermandariya Wezîr kir û jina wî ji bûyerê xeberdar kir. Çi gava şev reş bû û tarîtiyê konê xwe veda, pîreka Wezîr hahakê derket û bi lez xwe gihîştand ber sûra burcê.

3- Axaftina Mêr û Jinê

Gava çavên Sila ji jor ve bi jina wî ketin silav lê kir; wê jî silava wî vegirt û bi dengêkî nizim û bi dilekî xemgîn jê pîrsî:

– Ma gelo tişteki ku ez karibim ji bo te bikim tune?

Wî jî bi dengêkî hê nizimtir minemin kir:

– Lê çawa! Tu karî ji min re karekî pir heja û bi qîmet bikî; lêbelê ji bo biserketin û temambûna kefteleft û tekoşîna me divê ku tu aramiya xwe biparêzî û xwe bisipêrî Xwedê. Nebî nebî dudiliyek here ba dilê te, lewra bêhêvîti û dudilî riya perîşanî ye ye û aramî jî nifta felatê (sebir ferca xêrê) ye.

4- Amûratên Rizgariyê

Wê [jina wezîr] bi dengêkî mîna piste pistê jê re got:

– Maê tu bivêyî ferman bike, ez lê guhdar û fermanber im. Piştî vî peyvê Sila jê re weha got:

– Tu bi lez dagere mal û van tiştên ku ez ê bêjim ji min re bîne: Pêşî kêzikeke gûgerîn î mezin; du, şêst metre tayîkê zirav î hevrişim ku badekên wî ji yê konikê pîrê stûrtir nîbe; Sê, şêst

metre ji tayîkê zirav î zexmîstî; çar, şêst metre jî ji qinapê qalind û qencbadayî, pênc, werîsek ji yên stûrê herî qewî û saxlem ku bêqetandin giraniya gewdeyê min ragire, ji min re bîne. Daxwaziya min a şeşan jî dilopek hinguv e, ev ya dawî ye, lê girîngiya wê jî ji ya wanên min got kêmîr nîne.

5- Dawiya Xeberdanê

Jina wezîr guhê xwe lê tapêl kir û qenc li gotinên wî guhdarî kir; gava wî peyva xwe qedand wê gotinên wî yek bi yek lê wekiland da ku rastbîhîstina xwe eseyî bike. Wê diva ku jê bipirse ka ji bo çî wî kêzika gûgerîn xwestibû û dilopa hinguv dê bi kêr çî bihatina, lê Wezîr gotina wê birî:

– Xwoşewîsta min, ji vêga û pê ve yek deqyeke din jî bi tiştên bêkêr wenda meke, hema zû vegere mal û tiştên min xwestî bigihîjne ber destê min! Bi qandî çavniqînekê jî wextê me yê beyhûdebuhartinê nîne. Tu wer hisab bike ku ez ê rojêke din jî li vir, di bin mişraqa vî tava tûj de bê nan û av bimînim û eziyet bikêşim, bi lez bifitile mala xwe û daxwaziye min bîne cih! Piştî kêlikeke din tu dê bikêrî û bêkeriya wan bi çavên serê xwe bibînî û fam b

6- Vegera Jinê

Jinikê dijwarî û tengayiya ku mêrê wê tê de ye û eziyetê ku ew dikşîne his dikir, ji wê bûnê jî piçek ji dema xwe vale derbas nekir û hahakê ber bi mal ve lezand. Wezîr Sila jî bi sebr û aramî li benda vegera jinê, di cihê xwe de rawestiya.

Ji bûna biserketina planê wî di dilê wî de, hêvî û dilxişûsiyê gelek di ber hev de didan. Bêguman ew bawer bû ku kirina yek şasiyêke piçûk tîra xirakirina plan û bêencamiya ewqas xebat û keftelefta wan dikir. Belkî hebû ku yek ji wan yan jî herdu ecêbgerandî jî bibin.

Beşa Sisiyan

1- Li Qûntara Burcê

Jina Wezîr berdestê sibê dageriya û giha qûntara burcê. Çawa Wezîr banga wê ya nizim û dengê wê yê henûn bihîst pêre pêre ji serê tepika burcê bersîva wê da. Ji ber tengahiya wext Wezîr nikaribû planê xwe bi tevayî jê re hûrgilî bike; di şûnê de wî rabû zû, hê ku sibe rohnî nebûbû, beş bi beş dest bi gotin û pêkanîna planê xwe kir.

2- Pozê Kêzika Gûgerîn

Pêşî wî ji jinê re weha got:

– Tu kêza gûgerîn bi serê tayîkê hevrişim yê mîna konikê pîrê ve girêde û piştê dilopek hinguv berde ser pozê wê.

Dema wê ev tişt kir Wezîr weha domand:

– De încar kêzikê deyne ser dîwarê burcê û berê wê bi jor ve bide. Kêzik bê ku zanibe hinguv bi bêvîla wê ve ye, dê bihna hinguv bike û bike guman ku li ser serê dîwêr kewareke hinguv heye. Ji ber vê yekê jî dê ew, bi hêviya gihîştina cihê hinguv a hin bi hin bi jor ve hilkişê, lê bikudîne û qet ranaweste heyânî bigihîje serê burcê.

3-Li Ser Dîwarê Kelê

Herema Wezîr fermana wî bi cihanî; belê texmîna Sila rast derket, kêzik bi dîwarê kelê ve hevraz bû û kişiya. Gava wî wer dît li peyva xwe weha domand:

– Ez hêvidar im ku tu tayik jê re sist bikî û rehet li pey wê berdî, da ku ew xweş li dûv wê were. Çiku erke barê wê giran bibe dê wê jî gihîştina jorê biewiqîne. Jibîr neke, bi serê tayikê din bigire da ku planê me jî hev nepeski- le û hêviya me ya rizgariyê qut nebe.

4-Li Ser Serê Burcê

Kêzika gûgerîn heyânî ku gihîştê ser tepika burcê jî hilkişîna xwe qet ranewestiya. Ew tam li ber serî bû gava beysûsiyên pêşî yên rojê avîtin jora esman û nişanên berbangê xwe ramîdan. Ji xwe tu, pirs ji kêf û şadiya Wezîr Sila û jî dilxweşiya wî ya bi wê serkeftin û gihîştina kêzikê ya serê burcê, neke. Digel wê kêfê jî wî piçek ji wextê xwe vale berneda, bi destên xwe rahişte kêzika gûgerîn û piştê jî ji jina xwe re got:

– Hevalê, niha jî lez bike zû tayikê pembû bi yê hevrişim ve girêde.

Çi dema wê ew girêda, Wezîr tayê hevrişim jî nerm ve kişand ta ku bi serê tayê pembû jî girt. Piştê Sila got:

– Vêga jî wî benê qalind bi serê tayê pembû ve girêde.

Dema ew daxwaza wî jî hat cih, wî rabû tayê pembû jî bi ba xwe ve kişand ta ku benê qalind jî zeft kir.

Hê nû jina Wezîr daxwaziya wî fam kir û berî gotina wî weris jî bi paşiya qinap ve girêda. Sila bi lez wî jî kişand ta ku bi serê werisê zexm jî girt. Piştî vê biserketin û bidestxistina amûretên rizgariyê rûyê wî jî kêfa geşbû, lê vê kêfê tiştêk jî aramî û semaxa wî, jî giramî û encambîniya wî neguherand. Wî hahakê weris bi serê kelê ve girêda û piştê jî bo sehati û saxlemiyê bi şid kişand. Ji bo ku dilê wî li ser fetl û bade- kên wî, li ser ragirtin û zexmiya wî û li ser girêk û mehkemiya wî qenc tekeve cih car din giraniya xwe berda ser weris.

Dawiyê Wezîr baş bi weris girt, hêdî hêdî xwe pê ve berjêr kir û xuşikand heyânî lingên wî gihane erde û gavê pêşî yê azadiya wî bi paş ve jê re anîn. Xweşî û bizdekê bi hev re jina Wezîr

girt, ew jî kêfa kelogirî bû, îskeiskeke girîne û hiqîna kêf û şahiyê di dengê wê de tevî hev bûn û ketin gewriya wê. Ew ber pê ve diçû, wî qepaçê dikir û jî kêfa hem dikeniya û hem jî digiriya.

Ji bo ku roja xwe bi ewleyî lê derbas kin û gava şev jî hat birevin herin welat yan jî bajarekî din û li wir dest bi jiyaneke hêsa û nû bikin; jin û mêr hahakê bilez xwe avêtin şikefteke nêzik ku dike- te wî çiyayê bin guhê bajêr.

Dawiya Çirokê

1-Xewna Sultan

Ey hevalê xwoşewîst heçî Sultanê heyrîmayî ye bûyerên ku qet di dilê te de jî nasêwirin hatin serê wî; xem û keder pîr lê giran bûn û kul û derdan bando- riya xwe berdan ser da ku ew poşman bû bê çima li hebiskirina Wezîrê xwe lez kiriye. Ew baş tê gihîst ku piştî wendakirina Wezîrê zîrek ew jî heqê siyasetmedariya welatê xwe û jî ber barê serkeftinên dijminên der û dorên xwe tu carî nayê der. Ew jî kirinên xwe covan bû û jî ber vê yekê jî heyânî berdestê sibê xew nekete çavên wî.

Nêzî berbangê gava xeweke sivik ketê çavên wî û ew xirmaş bû, wî di xewna xwe de kêzikeke gûgerîn î piçûk ku bi dîwar ve hildikişîya jor, dît. Ew kêzik di nav tayik û werisên dirêj yên pembû û hevrişim de pêçayî bû û bêrawestan hin bi hin berjor hildikişîya heyânî nêzî ber serê dîwarî bû. Piştê kêzikê li ser dîwêr xwe weşand û barê xwe yê ben û werisîan li wir danî. Ji wan ta û werisîan hevokekî xetxweş î hijmekarhiştî saz bû. Wî (Padîşah) ew hevok xwend ku weha digot: "Bingeha samanî û serwe- riye dadmendî ye". Di pey de wî li pêşberî xwe nihêrt, dît ku wezî- rê zindankirî li ser textê wî rûniş- tiye.

2-Di Burca Telefbûnê de

Sultan bi tirs ji xew veciniqî û bi wê tirs û bihtê jî qîr da nobeda- rên xwe, li wan ferman kir ku derê burcê jê re vekin. Bi vebûna derî re şah bi lez kişiya serê bur-



cê; di rê de ew leqayî kêzika xewna xwe bû û ricfekê wî gir- vî alî wî alî ew li Wezîrê girtî ge- riya lê ew nedît.

3-Dawiya Zordarî

Hima wek niqîna çavêkî berê wî bi wî alî ve fitilî çavê wî bi werisê serê tepika burcê ve girêdayî û bi xwar ve daleqandî, ket. Wî jî bo sexîkirina rastiya bûyerê bi lez û bê hizir bi serê şerefika keleyê ve bazda. Gava ew wer bê ser û çav çû piyên wî şimitîn û terayî binê burcê bû.

4-Dilxweşiya Gel

Piştî demeke kurt, nûçe wek birûskêkê li her aliyê bajêr di nav xelkê de belabû û her kes bi vî bûyera xweş hisiya. Wan pîre pîre Wezîr Sila ji xwe re xwend- kar diyar kir. Giregir û mezinên bajêr hemû bi felata jî vî dewra

xedar pîr dilşad bûn û ji bo pê- kanîna viyana gel û biryara wan civiyan.

Wan jî bo gerandina li Wezîr qasid û peyamên xwe şandin her aliyên bajêr, lê wan peyaman tu salixekî jê hilnanî û êvarê bêhêvî û destevale bi ser wan ve dageriyan.

5- Sultanê Nû

Herçî Wezîr Sila haya ku tarîtiyê xwe baş berda erdê di şikefta xwe de rawestiya. Paşî ew û jina xwe jî şikeftê derketin da ku birevin û herin li welatekî ewletir bi cih bibin. Gava ew derketin û dengê kêf û şahiya xelkê bi awa- yekî nû bihîstin gelekî şaş bûn, ji- nikê rabû jî bo eseyîkirina bûye- rê, jî zilamekî ku li wan dera di- geriya, sedemê wê şahiyê pirsî. Wî mîrîvî ew nasnekir û bûyerê jî serî heyânî binî tev jê re gilî kir.

Piştî vî gotinê Wezîr Sila hahakê bi lez berê xwe da qesra sul- tan. Çawa giregir û berpirsi-ya- rên welêt û dewletê ew dîtîni bi lez û bez bi pêşiya wî ve kişiyan û bi dilekî xweş ew pîroz kirin.

Ji wê rojê û pê ve Wezîrê zin- danê bû sultan û xwendkarê we- lêt.

Yê ku ji Erebi wergerandiyê:

Emîn Narozi

Ev jî çirokeke Hindî a zarû- kan ku bi Zimanê Erebi bû hati- ye wergerandin. (Kamil Geylanî el-Wezîr es-Siccîn, Dar el- Me'arif, Misr, 1990)



Bi Kirdênda çorşmedê Madenî ya sohbetê -4-

Haydar Diljen

Şamiya Veyvî

-Veyve di şamî çiçi nanê ser?
-Veyve di jê hefte niqara koyêna. Ê jê hefte pêro êl top nêbeno. Ê yaxin-maxinî yenê hazirlixey vînenê. Ondan sonra xefîf yêmeg, dewarê filan birnenê, yêmeg vejenê; ara, taştî, şamî
-Şima nandê dihîri rê vanê taştî?
-E, ma vanê taştî, sêpare.
-Taştî û sêpare nanê dihîri yo?
-E. Tayn vanê taştî, tayn vanê sêpare.
-Nano bol, roja veyvî ya peyênî di yeno dayiş. Wexto çiçi nanê ser?
-Dewarî birnenê, jê liyo (lêno) gird kêber di (keyî ver di) nanê ra ser. Ferz êt manga birnawa. Dana, bizi, ya qoyini birnawa. Ey ciya nanê ra ser, ê dewardê sixirî ciya nanê ser. Lajdê xo rê vajî, qîmeyê ey vejenê. Verî qîme kuwayê. Ondan sonra qîme kuftan rê vejenê. Kuftan virazenê, fasûlîya pêwjenê, gûşt peyşeno, ayrî ayrî pîlaw (bilxul) pêwjenê.
-Şima bilxulî rê vanê pîlaw?
-Ma vanê bilxul.
-Verî riz nênayê ser?
-Pirinc çînêbî. Eger bî kî ardê sutlî pewtê. Sutlî şit ra, şeker û pirinc ra viraziyayê.
-Kufteyê çiçi viraştê?
-Kuftey, gûştê six vejenê, kuwenê ro, qîme kenê; bilxulo zey çigkuffî esto nika ya, ey virazenê, ma vanê "Maden kuftesî."
-Elezîzîjî zî vanê "Xarpût kufteşî", winî nê?
-E. Jê qazano gird, hîrê teyştî cenî alawenê. Inan virazenê. Jê qazanî kuftey, jêna kî fasûleyê etlî, jêna kî patatêzê etlî.
-Yanê goştin?
-E e, min xo şaş kerd. Gûşt ra. Tenê fasûlye goşt ra, patatêşî gûşt ra, bilxurê gûştî pêwjenê.
Wexto ki anê sifri ser, gûştî nanê bilxulî ser zî?
-E. Lajdê xo rê vajî. "sîrriwe-

ni" pêwjenê.
-Sîrriwen senîn o?
-Sîrriwen, di teyştê mîr kenê a. Nano tepilme kenê a. Qaban anê wija nanê ro. Jû pêwjenê, jû çewirmiş kena. A jû birnena. Mast û sîr, riwenê keyî daxilmîş kenê. Yanê di çeşidî, jê sutlî, jê sîrriwenî qatixlî (mastêni) bena. Fasûlîyey gûştî benê, kuftey gûştî benê, patatêşê gûştî benê, bilxulê gûştî beno. To zana. A nê garantî estê.
-Yanê heme veyvan di nê estê?
-E, heme veyvan di estê. Ê nikay dolman, molman kenê de. O wext di dolmey-molmey çînêbî. Sabûna girdi serdê banî yo finenê a, o ban îdare nêkerd, banda jênî ser o finenê a.
-"Sabûnî", yanê çiyoyê ki ma ci rê vanê "sifre", o yo?
-E, sifreyêndo (hîzarêda) zaf gird o. Didini kenê ra. Wija ra camêrdê pîlî nişenê ro, tiya ra nişenê ro. Yêmeg şino bonî ser. Sira sira nanê ro. Bando cêrên di qijikan rê nanê ro. Eynan ki baş kerd, cenîyan rê nanê ro.
-Verî camêrdî wenê, dima cinî wenê?
-E. Cenî zerre di wenê. Cenî nişinê teber. Cenîyê verênî winî bî.
-Ciniyê nikay senîn ê?
-Nika nan ça wo, kom nan dano? Gûşt werdo nara jê kilo. Dewar kotî yo?
-Ti vana verî halê mîletî ewroy weşêrî bî?
-Verî feqîrey-meqîrey nêzaniyê. Vatê, wa riyê ma bihuwo, ma heme çiyê xo bibirnê, wa nêvajê çiyê xo çiniyo.
Çinayê zamay
-Verî çinayê zamay senî dayê pîra?
-Gincê zomay?
-E, gincê zamay. May û pêrê keyneki zamay rê çina girotê, yanê lajekî girotê?
-Verî kê keynekerî kesî zomay rê teba nêgirotê. Belkî jû komlegî, jû îşligî-mîşligî girotê se o başqe. Teba nêgirotê. Nika gênê.

FERHENGÊ KIRDKÎ-PEHLEWKÎ-KURMANCKÎ-XI

Malmîsanij

Kirdkî (Zazakî)

-m
ma
make, mayki, mayike
makî, maykey, makey
mar
mari, ma, maye, dayke
mase
mast
mayîne
me-
mele
mende
mendene, mendiş
mendiş
mendeyî, mendîşey
meqeseki
mercî, marci
merd
merde, marde
merdene, merdiş
merdiş
merdum, mêrdim, mordem
merdumek, mêrik
merdumî, mêrdimî, mordemî
merg
merge
merre, misk
meşke
meşkeki
meyese
meyman, mêmân
meymanî, mêmaney
mezg
mêrde
mêşe
mêşna, mîye
mêwe, meywe
min, mi
mird
mirênayîş, kiştîş
mirîçike, liçike
mirûy, mirwi
mist
mix, mîx
miyan
miyançî
miyançîyey
miyane, mêne, paştî
mîzi
mîzi kerdene

Pehlewî(1)

-em, -om
emah, emak
matek
matekîh
mar
mat, mam
mahîk
mast
matyan, metyan
ma-
melek, melex
mandek
manden, manten, manîten
manîşn
mandekî, manîşnîh
meges kasekên
miçûk, mişûk
mert, mêrek
murtek
murten
mirişt
mertom, mert
mertomek
mertomîh
merg
merv, murv
mûşk, mûşek
meşk
meşkîçek
meges, mekes, mexş
mahman
mahmanîh, mehmanîh
mezg
mêrek, mîrek
vêşek, vîşek
mêş
mêvek, mîvek
men
sêr, hamburt
murncênîten, kuştin
murvîçek, morvek
urmût
must, muşt
mîx, mîx
miyan, meyan
meyançîk, miyançek
miyançîkîh, meyançekî
miyan, kemer
mêz
mêzîten

Kurmanckî

-m
em
mak, mê
makî, mêyî
mar
dê, dayk
masî
mast
mehîn
me-
kulî
mayî
man, mayîn
man, mayîn
mayînî, mayîn
mêşa kesk
nîsk
merd
mirî
mirin, vemirîn
mirin
meriv, mirov
mêrik
merivtî, mirovayî
mirin
mêrg
mişk
meşk
meşka piçûk
mêş
mêhvan, mêvan
mêhvanî, mêvanî
mêji
mêr
mêşe, daristan
mêşin, mî
mêwe, meywe, fêkî
min
têr
kuştin
mirîşka piçûk
hirmî
mist
mix, bizmar
nav, navbên
navbênçî
navçîtî
pişt
mîz
mîztin

(1) Kelîmeyê Pehlewîyê ki tiya di nusiyayê, mi nê kitabî ra vîjney: Dr. Behram Frewşî, Ferhengê Pehlewî

Nika pîcema gênê. Hal û wextê xo rind bo se, elbîsa siyayekî birnenê.
-Verî çinayê zamay senî dayê pîra?
-Jû îşliga rindi dayê pîra. Diha ki ma resay, pantolî mantolî bî. Yanê ê qolî bî. Ê ki bizmeyê ci dugmelî bî.
-Verê qolfan şelwerî bî, winî nê?
-E, verê ci şelwerî bî. Diha nê genc-mencê ki resay qolî girotê, jûna komlegî, îşte çakêt.
-Şima hetî zî şelwerî bi xo viraştê?
-Ê cenîya?
-Nê nê, ma hetî vatê çilagey.
-Şalî?
-E, şalî.

-E. Şalî riştê. Ez zî zana birêsa. Tiştawa peşmî kerdê pa, kerdê şane ro, riştê û ê berdê kerdê şalî û şelwerî biçimî biçimîş kerdê (fesilnayê) û kerdê pay. Jêna Soyregî ra 'ebey ardê rotê. Vatê 'ebay Soyregî. Zaf meşûrî bî.
-'Ebeyê dergî, kilmî? Sêwregî di, di babetî 'ebey estîbî.
-Îşte baskî qitkey kilmî bî.
-Kurmançê heta Sêwrega, Dimiliyan rê vanê "Ebeqûten Sêwregê." Qut, yanê kilm o.
-Ma hewna vanê 'ebay Soyregî. Vanê "la no çiçi yo, gêniş (hera) kerdo, ze 'ebay Soyreki?" Îşte 'ebay Soyreki ardê xo rê girotê. Jê xalzay marda min bi, nameyê ci Qeya bi. Şîbî Xarpêt, pêrê min

tim tim na vatê, ma pey merdê, zaf pîr bî. Zaf rind bî, hewl bî, siya bî siya bî zey zenciyan bî. Ame, pêrê min va, "la Qeya to çiçi giroto?" Va "la çiçi eriyêno, teba nêeriyêno, min Êm rê jû pû-şî giroto." (Êmi cenîya ci bî)
Piyê min Qeyay ra zaf hes kerdê. Piyê min zaf yaman bî. Culêran pêrdê min ra bîxî . Piyê min a ci nêkewtê. Çend serî Culêran mudafa kerdê.

Dewamê ci esto.

Yewbiyayena Kurdan qezenc kerd

N. Elî

24ê Araliqê di vêşaneyê Kurdan, bi taybetî jî Kurdê mintiqandê ki tehdâ û zilmê dewletî vêşerî înan ser o estbî, rayê xwi day HADEP (Partiya Şarî ya Demokrasî) û hem mojnay mesûlanê dewleta Tirkîye hêm jî mojnay dinyay ki ê vera (qarşidê) siyasetê dewleta Tirkîye yê. Helbet kiştâ bîn ra jî mîletê ma mojna siyasetmedaranê Kurdan ki ê bixwi, xwi miyan di yew bê, mîlet hadire ya ki paştiya înan bigîro. Zek yeno zanayîş, bê Şerefettîn Elşî û embazandê ci hema hema temamê Kurdan nê weçînayîşî (seçim) di paştiya HADEPî girotî û rayê xwi day ay.

Xerîteya siyasî ya Kurdistanê Vakurî kîlîtê ayabiyayena millî jî dano ma dest. Xeylê cayan di partiyanê Tirkîye eşîran ra ray girotî. Labelê tayn cayan di jî rind eşkera bi ki ayabiyayena millî xeylê kemû ya û şûrê kurdbiyayeni zê if o. Cora jî HADEP nêşa xeylê rayan bigiro. Helbet çiyêno eşkera yo ki wext teng bi û îmkanê na partiye çinêbî ki propagandayê xwi rind bikero. Labelê sebebo esasî averşiyayena şûrê millî yo.

RP (Partiya Refahî) Kurdistan di jî xeylê ray girotî û wexto ki merdim temamê Kurdistanê Vakurî bifikiriyo, RP bi % 30ê rayan a Kurdistan di jî bi partiya yewini. Heta cayê zey Bedlîsî di % 80ê

rayan girot. No weçînayîş qandê CHP û DSPî bi dersê. "Sosyal Demokrat"anê Tirkîye xwi rê Kurdistan di ca nêverda. CHP wertaxê ay hukmatî bi ki Kurdî pêrîşan kerdî. DSP jî bi siyasetê Ecevitî yê vera Kurdan a amê sinasnayîş. Labelê RPî bi raya dîni, DYP û ANAP jî bi raya eşîran a Kurdistan di xwi linan ser o mendî.

Na destpakerden a, heke Kurdî xwi miyan di yewbiyayena xwi virazê, çendna seran miyan di şenê dersênda zey darsa ki deyê CHP û DSPî bidê partiyanê Tirkîye bînan jî. Mîletê ma kîlîtê çareyî dawo ma dest, ray naya ma ver, a ray jî yewbiyayena ma ya.

Heqê kesî çiniyo ki werzo hvajo nê rayê min ê û hesabê xwi înan ser o virazo. Nê rayê rayê Kurdan ê. Ne rayê PKKî tenya yê, ne jî ê partiyanê bînan tenya yê. Nê ray rayê yewbiyayenê. Eke siyasetmedarê ma mesaja mîletê ma raşt fahm nêkerê û bi ca niyarê, o wext guna ê înan o, ne ê mîletê ma wo.

Temsilnêbiyayîşê Kurdan bi raya HADEPî meclîsdê Tirkîye di neheqey a. Eke ma Kurdî yew bê, ma do bişê vera na neheqey di vînderê. Ewro Ewrûpa û heme dinyay çimandê xwi ya di ki Kurdî bi temsîlkarandê xwi ya meclîsdê Tirkîye di temsîl nêbenê û no meclîs nêşeno Kurdan temsîl bikero. Kurdî bi yewbiyayena xwi ya şenê temsîlkerdaxanê xwi vejê meydan.



HADEP Diyarbekir di 152.791 rayî girotî

Netîceyê Rayan

Kurdî temsîl nêbenê

Roja raydayeni di xeylê şaristananê (sûkandê) Kurdistanê di Kurdan rayê xwi day HADEP. Mintiqanê ki tehdâ û zordareyda dewletî ra vêşerî bara xwi girotî, HADEP bi partiya yewini. Hekarî di % 54,35, Diyarbekir di % 46,46, Batman di % 37,35, Wan di % 27,75, Sêrt di % 26,68 û Ixdîr di % 21,71 rayan a HADEP bi partiya yewini, Şirnex di % 26 a û Mêrdîn di % 22 ya bi partiya didini û Agrî di jî % 18 a bi partiya hîrîni. Labelê semedê barajî ya nêşa mebusanê

xwi birişo meclîsdê Tirkîye. Cora jî Kurdê ki rayê xwi day HADEP bê temsîlkerdaxanê xwi mendî. Eke baraj nêbiyayê HADEP şayê 25 mebusan birişo meclîs û meclîs di grûba xwi virazo. Rayê HADEPî temamê Tirkîye di % 4,31 di mendî. Temamê Kurdistanê vakirî di nisbetê rayandê HADEPî % 17 di mendî.

CHP û DSPî Kurdistan di xeylê kemî ray girotî û nêşay mebusî vejê. Namzetê CHPî yê Şernexî Şerafettîn Elçî Şernex ra niyame weçînayîş.


PKKî lej vînderna

Serokê PKK Evdila Ocalanî 10.12.1995 di MED TV di îlan kerd ki PKKî lejo ki 25'dê mengda Agustose di vera PDK îlan kerdbi, kiştâ xwi ra dawo vîndernayîş. Zek yeno zanayîş PKKî kombiyayîşdê Dublînî dima bi semedê ki pêameyîşê PDK û YNKî vera înan biyo, vera PDK lej îlan kerd û hucûmê 20 qereqolanê PDK kerd û va ki no hemleyê didin ê 15ê Agustose yo.

Nê lejevîndernayîşê PKKî ser o PDK jî beyanê vi-

la kerd, lejevîndernayîş qebûl kerd û waşt ki PKK nay ra tepiya têkilê kar û girwey Kurdistanê Başûrî nêbo.

Kiştâ bîn ra rojê 14ê Araliqê di serokê PKKî, MED TV di bi raya tele-konferansê îlan kerd ki înan kiştâ xwi ra lejê vera dewleta Tirkîye dawo vîndernayîş û o wazeno ki mesela Kurdan bi raya aştbîyayeni bêro çarekerdene.



Resmandê serra 1995'i ra resmêndo weşerîn